

**L** i Tirkîyeyê problema herî muhîm û mezin meseleya kurdan e, lê ji bo meseleya kurdan tu tişt neguheriye, eynî polîtîka dewam dike. Mesela agirbest heye, tu kesî negot, "Wa ye agirbest heye û ev li ser de, operasyon pêk anîn û dîsa ketin Başûr. Yanê zihniyeta wan, polîtîkaya wan a esasî neguheriye.

Têkoşîna ku em didin ne ji bo hilbijartinê ye. Hilbijartin ji bo me talî ye, karekî din e. Armanca me ne mîna ya partiyên din e. Ha ketin meclîsê, ha neketinê ev ne muhîm e. Tenê divê problem çareser bibin. Em ji bo vê dixebitîn. Eger armanca me mebûsbûn bûya, ne di nav HADEP'ê de, di nav partiyên din de, meyê cihê xwe bigirta û emê bûbûna mebûs.

Rûpel 8-9


Serokê Giştî yê HADEP'ê  
Murat Bozlak

Xebata me ji bo careyan e



- "Ez bi torinên xwe re li ser çiya me", nivîskarê me A. MELIK FIRAT, bi mebesta yadkirina 72 saliya daleqandina Şêx Seîd û hevalên wî nivîsî." Rûpel 6-7
- Berxwedana girtiyên azadiyê û piştgiriya ji bo wan li cografîyeye fireh didome. Ev têkoşîn bêhnê li "Wezîrê Dadê Mehmet Ağar" diçikîne. Nûçeya METİN AKSOY Rûpel 3
- "Tirkiye bûye dilê metirsiya parçebûnê" SAMÎ BERBANG bi vî sernavî rapora Human Rights Watch'ê û nivîsa kovara navdar The Economist" nirxandin Rûpel 4-5

NAVEROK




10

Alî Tîco: Hunermend zana û dadger e



12

Salihê Kevirbirî: Di zargotina kurdî de rola dengbêjan



13

Zana Farqînî: Xebateke azmûnerî; Adarê

Ji Xwendevanan

ÇEND daxwaz ji Azadiya Welat: Ger gengaz be rûpelên rojnameyê zêdetir bikin. Peyvên hê nû, wateya wan baş binin holê. Hûn dikarin li hemberî wê tirkiya wê binivîsin. Hûn cih bidin helbestan, baweriya min ew e ku rojname wê hê bêhtir li xwendevanan xweş were. Kesên li ser helbestan dixebitin jî wê ji wan tecrûbeyê bistînin.

Lewre di vî warî de di destê me de çavkaniyên bi kurdî tune ne. Heta ji we were cih bidin kurteçirokan jî. Ji bo ku rojnameyê di aliyê aboriyê de xurt û dewlemend bibe hûn dikarin numereyeke hesabê biweşînin, em xwendevan jî jê re bibin alîkar.

Silavên xwe yê germî jî we re dişînim. Serkeftina wê daxwaza min e.

BERKEN BEREH

ÎRO li cihanê her gel bi zimanê xwe dixwîne û dinivîsîne. Lê gelê kurd ziman, çand û dîroka wî berteref bûye û ji aliyê xwînxwaran ve hatiye veşartin û guhartin. Bi alîkariya Azadiya Welat gelê kurd jî dikare bi zimanê xwe yê zikmakî binivîse, bixwîne, dîrok û çanda xwe hîn bibe. Pêwist e her kurd Azadiya Welat bistîne, bixwîne da ku rojnameya me weşana xwe bi hêsaniyê serfirazî bike. Daxwaza min ew e ku Azadiya Welat her dem weşana xwe dom bike, ne wekî rojnameya "Welatê Me" dawiya wê were.

BAHATTIN ÖZDEY/AGIRI



Hîmê berhemên nivîskî ziman

MEHMET GEMSİZ

Devera ku tu tişt lê ne li rê be, li wê nîqaş û gengeşî heye. Bi vî rewşê re jî geremol, gējahî û alozî derdikevin holê. Sedem jî ev e: An çerxa pergale terîbiye an jî bi teqil digere.

Îcar ev nîqaş jî, an ji ber xwe an jî bi têkilîpêkirinê (mudaxaleyê) diqewimin. Li vir, tiştê girîng ew e ku, mirov bi vî û xweza xwe têkilî bi tiştê bike û di dawiyê de rengê xwestina xwe bidê. Eger guherîna pergale hatibe xwestin, gerek dike ew kes pergala xwe ya ku dixwaze, di şûna ya din de bi cih bike. Ne wisa be, ew dibe têkilîpêkirineke neyînî.

Kurdên bakurê Kurdistanê, bi pênga-va 15'ê gelawêja 1984'an, ew daxwaza xwe ya guherîna pergale û terîbandina çerxa wê, pêk anîn. Ji çerxa pergala kemalî re "rawestê" gotin. Ji wê rojê heta îro ev têkilîpêkirina vî (îradî) didome.

Ev têkoşîn jî, ji her hêlî ve didome.

Wekî têkoşîna çekdar, têkoşîna siyasî û diplomatîk, têkoşîna çandî û hwd. Ji van jî, mebesta min ew e ku ez li ser têkoşîna çandî rawestim.

Li bakurê welêt, bi saya têkoşîna çekdar, qedexeya li ser zimanê kurdî hate hilanîn. Kurdan li ser dîrok, çand, wêje, muzik û hwd. xebatên baş û hêja kirin. Ew xebat bi piranî hatin qedexekirin, rê li ber weşan û belavbûna wan hatin girtin. Her çendî ku di qanûnên Tirkiyeyê de, der barê hebûna kurdan de tu îbareyek, çî erênî û çî jî neyînî nîn be jî.

Di gel vî rewşê, kurdan di vî eniyê (cephê) de gavinên girîng avêtin. Ketin qonaxa jixwepirsînê.

Dest pê kirin, li ser kok û eslên kurdan xebatên dorfireh û kûr kirin, pê re jî nîqaşên li ser vî warî mezintir bûn, ku niha jî berdewam e.

Her wiha, di warê wêjeyê de nîqaş

çêbûn; bi taybetî jî li ser roman û helbestvanan, ku ev yek jî hîna didome. Tê pirsîn ka romana kurdî heye? Helbestvanê (şairê) kurd kî ye? Digel "hebûn" û "nebûna" romana kurdî, di warê wêjeyê de mijara zimên xwe derdixe pêş. Pirs ev e: Divê zimanê romanê kîjan be? Ji bo "helbestvan" jî her eynî pirs tê pirsîn.

Li vir ramana giştî, baweriya giştî ev e ku, ziman diyarker e. Ramana min jî ev e ku, çî berhemên wêjeyî yê ku ji aliyê kurdan ve hatibe nivîsîn û zimanê wan ne kurdî be, ew ne yê kurdî ne. Mirov dikare bibêje ku ew "ên kurdan" in û li ser kurdan hatine nivîsîn.

Bi ya min jî, çî tiştê ku bi riya zimên bê afirandin, ew bi kîjan zimanî hatibe afirandin, malê wî zimanî ye. Ji ber ku hîmê çandê ziman e.

Kes nikare têkiliya di navbera ziman û derûniya mirov de jî înkâr bike. Lewma zimanê berhemê nasname berhemê bi xwe ye.

Di dawiya nivîsê de, em jî gelşekê bin rojevê û jî nîqaşê re vekin. Wekî di edebiyatê de, di rojnamegeriyê de jî rola zimên ew çend mezin e, li vir jî ziman, hêmaneke diyarker e gelo?

Rewşenbîrên dûrî şer

Hin mirov hene ji wan re dibêjin rewşenbîr, lê belê ew û rewşenbîr dûrî hev in. Ji ber ku jiyana wan di nava rûpelên pirtûkan de derbas bûye û dibêjin qey çî hebe tune be di pirtûkan de ye. Ji ber wê yekê jî, ji jiyana bi dîr ketine.

Tiştin hene û bûyerên ku çêdibin, gelekî dûrî tiştên di pirtûkan de ne. Pêwist e ku mirov pirtûkan bixwîne û lêkolînê li ser çalakiyên nivîskî bike. Lê belê divê tiştên di pirtûkan de û tiştê di pratîkê de diqewimin, mirov bide ber hev û wiha bifikire. Heke ne wisa be ew rewşenbîr wê ji bûyeran bi dîr keve û wê bibe robot.

Rewşenbîrê gel ê bindest divê hîn pirtir li ser bûyerên ku li welatê wî diqewimin bisekine û lê bikole.

Her tişt di pirtûkan de nîn e

Mixabin hin rewşenbîrên kurd hene (ku mirov karibe ji wan re bibêje rewşenbîr) ji qonaxa têkoşîna xelasiya welatê pir bi dîr ketine. Ew rewşenbîr wekî me li serî jî got, serê xwe, ji ser pirtûkan ranekirine. Rojekê tenê di domana xelasiya welatê de piyên xwe neavêtine welêt; rewşa gelê xwe qet û qet bi çavên xwe nedîtine. Ji 15 hezar kilometrî dûrî welêt teoriyan bi rê dixin, û nexşeya li ser kaxezê diparêzin. Ew kes tew bi ser de dibêjin: "Rêberiya ku derketiye holê ne rast e."

Bawer bikin şivanekî ku li welêt di-

**Ew rewşenbîrên ku pêkûtiya Komara Tirk meşrû dibînin, tu carî di girtîgehê de, di nava ava de pîs raketiye? Ew çend şevan ji bo ku neyê girtin li derveyî mala xwe maye? Tu carî ji birayê xwe jî fikara xayîntiyê kiriye**

ÇIYA MAZÎ

Jî û xwendin û nivîsandinê zanibe, ji wan hîn bêhtir rewşenbîr e. Çawa?

Ew şivan bi jiyana xwe tevî di nava têkoşînê de ye; ji serî û hetanî dawiyê xebat bi çavê xwe ditiye. Têkoşînê çawa dest pê kiriye, çawa gel pêl bi pêl rabûye ser piyan û serî hildaye; mirovên kurd çawa di îşkencexaneyan re derbas bûne, li gundan çawa deh bi deh şehîd bûne. Ew giş bi çavên xwe dîtine.

Di vî pevajojê de psîkolojiya mirovan çawa hatiye guherandin, mirovên baş û nebaş çawa ji hev cuda bûye. Di firehiyê de mirovên derewker çawa pir in û di tengasiyê de mirovên rast jî çiqas fedekar in. Fêrî van tiştan gişan dibê. Haya wî jî niqteya biçûk hetanî ya mezin çêdibe. Lewre ew di nava têkoşînê de ye.

Wî şivanî bi hezaran pirtûk jî bixwendana ew qas fêrî van tiştan nedibû. Dîsa fêrî, mirovên di firehiyê de wekî şeran xuya ye, lê dema roja giran tê di-

bin pisîk, xayîntiya şexikên ereban û devşormeyên riyakar dikin, nedibû.

De bibêjin îcar kî ye rewşenbîr? Ew rewşenbîr ên ku pêkûtiya Komara Tirk meşrû dibînin, gelo tu carî di girtîgehê de, di nava ava pîs de raketiye? Gelo ew, çend şevan ji bo ku neyê girtin li derveyî mala xwe raketiye? Gelo tu carî ji birayê xwe jî fikara xayîntiyê kiriye, tu carî rojnameya bi kurdî ji bo pê re neyê dîtin, xistiye bêrika xwe ya hundir, tu carî şervan ditiye an na?

Yê ku ne di nava şer de jê fêm dike?

Şervan çawa dijîn, çawa şer dikin? Gelo tu carî bi dengên tank û topan û balafirên ji xew rabûye an bi dengê "kalkin lan o..... çocukları" ji nava nivîsê xwe çengî bûye, tu carî leşkeran ew li cem zarokên wî tazî kirine. Gelo tu carî namlûya mirovkuj a paş dîwaran li paş stûyê xwe hîs kiriye? Na. Ez bawer dikim ji van bûyeran yek jî nedîtine. Mirov kare van mînakên bi qasî pelên daran zêde bike.

Yê welatparêz û yê rewşenbîr ew e ku; ew bûyer bi xwe jiyabin an ji kula yê ku jiyaye di dilê xwe de hîs kiribe û alîkariya wan kiribe.

Mafê tu kesî tune ye wê tab û keda gel ku bi vî awayî hatiye holê qerfê xwe pê bike û li ser keda wan rûne û bibêje ez welatparêz im. Wê gelê kurd di vî riya xwe ya rast de bimeşe, yê ku xeletiyê û xayîntiyê bike, wê di bin lingên wan de biperçiqe.

**LI HAMBURGÊ** bi navê "Ber bi Kurdistanê meşa aşiyê" kurdan meş û xwepêşandanek çêkir. Roja 15'ê pûşperê zêdetirî 150 hezar kes li Meydana Moorweide kom bûn. Wan bi pankart û sloganên xwe hewldana kuştina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan lanet kirin û çareseriyêke siyasî jî bo kêşeya kurd xwestin.

Di xwepêşdanê de tevî kurdan gelek sazî û dostên kurdan jî cih girtin. Bi taybetî xwediyên Danezana Frankfurtê di nav amadekarên meş û xwepêşandanê de cih girtin. Her wiha hunermendên wekî Ciwan Haco, Şivan Perwer û Koma Berxwedan bi deng û awazan piştevaniya xwepêşandanê kirin.



**Ji bo** piştgiyariya Rojnameya Demokrasiyê roja 16'ê pûşperê li Enqereyê pîrozbahiyek çêbû. Di pîrozbahiyê de bi taybetî axaftina Serokê Heyeta Şewirmend a Weşanê ya Demokrasiyê Fikret Başkaya gelekî bal kişand. Başkaya şert û mercên giran ên ku çapemeniya kurd tê de ne bi bîr xist û bi zimanekî rexneyî jî xwendevanan xwest ku ew xwedî li rojnameya xwe derkevin.

Zêdetirî 10 hezar kesî li "Atatürk Spor Salonu" jî bo pîrozbahiyê kom bûn. Hunermendên wekî Yavuz Bingöl, Ferhat Tunç, Mazlum Çimen, Fırat Başkale, Ozan Delil, Koma Amed, Aynur Doğan û Ahmet Kaya bi stranên xwe dilê beşdaran geş kirin.

## NÛÇE

# Greva birçîbûnê bêhna Aġar diçikîne

**P**îştî ku dewletê 19 girtiyên PKK'yî sîrgûnî Zîndana Dîlûkê kirin, çalakiyên jî bo piştgiyariya berxwedana girtiyan her roj berfirehtir dibe. Li Tirkîyeyê li navendên Partiyên û saziyên demokratîk bi hezaran însan bi domdarî û dorvegerî grevên birçîbûnê didomînin.

Li hêla din Rêxistina Efüyê Komeleya Mafên Mirovan, Weqfa Mafên Mirovan, rayedarên HADEP'ê, hin mebûsên SHP'ê, Serokê KESK'ê Siyami Erdem, Serokê DİSK'ê Rıdvan Budak, Serokê Baroya Stenbolê Turgut Kazan, Serokê Komeleya Nivîskarên PEN'ê Şükran Kurdakul, rayedarên ÖDP'ê û bi sedan kes û saziyan helwesta dewletê ku li hemberî daxwazên girtiyan bêdeng dimîne, bi daxuyanî û çalakiyan şermazar kirin. Hinekên jî van jî bo ku mirin çênebin, jî girtiyan tîka kirin ku ew rojîya mirinê vegeerînin ser greva dorvegerî. Li gorî dîtina wan "ji ber ku îro hikûmeteke li ser kar tune ye, valahiyek di warê rêvebirinê de heye, lewre jî kesên Mehmet Aġar îşkencekar bersivê nadin daxwazên wan."

Cîgirê Serokê HADEP'ê İsmail Arslan heftiya borî çûbû Dîlûkê. Wî bi 19 girtiyan ku ketibûn greva bêmuhtelê re hevdîtinek çêkir û jî wan xwest ku berxwedanê bi dorvegerî bidomînin. Wan jî ev yek qebûl kir û piştî 16'ê mehê grevê bi dorvegerî didomînin.

Her wiha girtiyan ku rewşa tendurîstiya wan xerab bûne û vê gavê di nexweşxaneyê Dîlûkê de ne, diyar kirin ku doktor bi tendurîstiya wan re eleqeder nabin, heke bi vî awayî bidome ewê careke din dest bi greva domdar bikin.

Her wiha mebûs û serokên sazî û komaleyan û partiyên jî hin daxuyanî dan. Mebûsê CHP'ê Ercan Karakaş bangeke vekirî jî Wezîrê Dadîyê Mehmet Aġar re şand. Karakaş di daxuyaniya xwe de bang li Mehmet Aġar dike û wiha dibêje: "Rewşa girtiyan û malbatên wan bû-



**"Mirovê ku dibêje, 'Di girtîgehan de problem tune', 'Dewlet bi kesî re bazarê nake', 'Mafê girtiyan ê mafxwestinê nîn e' û xwe li pişt baweriya 'dewleta pîroz' vedişêre, her wiha bi vî mantiqê 'heke girtîgeh nebûna minê wezaretiya dadê hêsantir bikira' nikare pîrsgirêkan çareser bike."**

ye pîrsgirêka civakê. Mirovê ku dibêje, 'Di girtîgehan de problem tune ne', 'Dewlet bi kesî re bazarê nake', 'Mafê girtiyan ê mafxwestinê nîn e' û xwe li pişt baweriya 'dewleta pîroz' vedişêre, her wiha bi vî mantiqê 'heke girtîgeh nebûna minê wezaretiya dadê hêsantir bikira' nikare pîrsgirêkan çareser bike û lewre jî bila dev ji wezîrtiyê berde."

Ebûqatên Komeleya Hiqûqvanên Hemdem 'ÇHD'ê jî biryar dan ku heta Wezîrê Dadê Mehmet Aġar giştînameyên (tamîm) 6, 8 û 10'ê gulanê jî paş ve nekişîne ew nakevîne deweyên li DGM'yê. Serokê Baroya Stenbolê Turgut Kazan jî daxuyaniyek da, di daxuyaniyê de bal kişandiyê ser girtîgehan. Wî got: "Demêke pêşde hewce ye dew-

let bersivê bide daxwazên girtiyan û ew biryarên ku Mehmet Aġar jî standine ne qanûnî ne û jî bo ku bêne îptalkirin me serî li dadgeha bilind daye." Kazan bang li girtiyan kir ku bila dev ji grevên domdar berdin.

Partiya Azadiyê û Piştgiyariyê "ÖDP" jî, jî bo ku Wezîrê Dadê Mehmet Aġar îstifa bike 20 hezar îmze berhev kirin û jî wezaretiya dadê re şandin.

Li Stenbolê ev serê sê heftiyên e ku hêzên dewletê bi tu awayî destûra xwepêşandan, meşan, çalakiyan nadin. Dîsa jî kesên aştxwaz, welatparêz, hunermend, saziyên demokratîk jî bo protestokirina helwesta dewletê li cihên cur bi cur xwestin çalakiyên çandî, hunerî û telgrafan bişînin. Lê polîsan wekî her carî ew kes bi girseyî hildane binçav.

Komeleya Mafên Mirovan "İHD" jî, jî bo ku helwesta dewletê protesto bikin bi tevî sih ebûqat û hunermendî xwestin jî Serokwezîr Mesut Yılmaz re li postexaneyê Sirkeciyê telgraf lê ew jî bişînin jî aliyê polîsan ve hatin binçavkirin. Li girtîgehan jî her roj berxwedan zêdetir dibin. Li Girtîgeha Erziromê ya ku 35 girtiyan dest bi greva domdar kiribûn, 35'ên din jî beşdar bûne. Li girtîgeha Qeyseriyê jî 19 girtî dest bi greva domdar kirine. Her wiha li 50 girtîgehî her roj grev zêde dibin, girtiyan ku ne siyasî ne jî beşdarî grevan di-

bin.

Li Enqereyê jî malbatên girtiyan çûne Navenda DYP'ê xwestine ku bi Tansu Çiller re hevdîtinek çêbikin, lê polîsan tev bi lêdan jî navenda partiyê dûr xistin. Her wiha hin malbatên girtiyan çûne Enqereyê bi Necmettin Erbakan re hevdîtinek çêkirin.

Li Kurdistanê û Tirkîyeyê her roj grevên birçîbûnê pêl bi pêl berfireh dibin. Li navendên HADEP, SİP, EP, DBP û ÖDP'ê jî bo piştgiyariyê bi hezaran kes grevên birçîbûnê didomînin. Li Edeneyê şaxa NÇM'ya Edeneyê bi daxuyaniyekê helwesta dewletê li hemberî girtiyan û malbatên wan şermazar kirin. Li avahiya HADEP'ê 40 kes sê rojan carekî bi dorvegerî grevê didomînin. Her wiha li Edeneyê KESK, Eġitim-Sen û gelek saziyên din jî bo piştgiyariyê dest bi grevên birçîbûnê kirine. Li Mêrsînê jî 65 kes jî bi dorvegerî grevê didomînin.

Li Amedê jî berî çend rojan ku malbatên girtiyan li RP'yê dest bi grevê kiribûn, bi wê mebestê mebûsê RP'yê yê Amedê Nayim Geylani û Ferit Bora jî bo ku pîrsgirêkan girtiyan û malbatên wan bê çaresekirin jî Erbakan daxwaza hevdîtinekê kirin. Li hêla din Erbakan jî diyar kir ku heke ew bibe serokwezîr wê pîrsgirêka girtîgehan û girtiyan çareser bike. Her wiha li Amedê bi tevî tahdeyî û zordariya dewletê li ser malbatên girtiyan grevên birçîbûnê didome, jî destpêkê heta îro polîsan pir kes hildane binçav û ew tehdît kirine ku çalakiyên berxwedanê biqedînin.

Li İzmirê endamên NÇM'ê jî dest bi greva birçîbûnê kirin; li navenda HADEP'ê 86 kes, li Aydinê 75 kes, Manisayê 64 kes, Eskişehir û Qeyseriyê bi sedan çalakvan grevên birçîbûnê didomînin. Li Qeyseriyê polîsan êrişê ser malbatekî kirine û kesek hildane binçav. Li Dîlûkê jî polîsan êrişê biriyê ser navenda HADEP'ê bi mebesta ku ew jî MED-TV'ê re dimenan dişînin Serokê HADEP'ê Niyazi Bulgan û 16 kes hildane binçav. Pişt re ew derxistine dadgehê û hatin berdan.


Li Ewropayê jî jî bo berxwedana girtiyan çalakiyên piştgiyariyê pêl bi pêl berfireh dibe. Li Hamburgê bi sedan kes bi dorvegerî di grevên birçîbûnê de ne. Li Bruksela Belçikayê jî çalakiyên piştgiyan berdewan e. Di çapemeniya Ewropayê de jî li ser helwesta dewleta tirk û îşkencekariya Mehmet Aġar her roj nûçe tên weşandin.

METİN AKSOY

### Rêheval Azad

*Evîna dilê te ez dizanim.  
Axîna te û evîna te bû sonda serkeftinê  
Wexta tu bûy pilingê serê çiyayê  
Min zanibû egîtiya te wê bi nav û deng be  
Roja ku te bi xwîna xwe  
Çiyayê Çêrmûkê hejand  
Reng bi reng kulilk vebûn li ser axa te  
(1974 - 29 Pûşper 1993)*

Li ser navê hevalên wî Raperîn Arya



Bedran (Azad Firik)

# Tirkiye bûye dîlê metirsiya parçebûnê

Hemû gotinên rayedarên dewletê heta derekê rast xuya dikin. Ev der jî sînorê rojhilat e. Dema mirov derbasî rojhilatê Tirkiyeyê dibe û rewşa gundên şewitandî, çolên bêmirov û koltîkên li dor bajaran dibîne menzere diguhere. Ew menzere tiştine ji gotinên ku mirov li Enqereyê dibihîze cudatir dibêje. Diyarbekir dişibe bajarekî di bin dagirkeriya leşkerî de.



her roja ku diçe, çepera li dor komara tirk tengtir dibe. Ev yek dibe sedem ku hin sazî û weşanên biyan li ser Tirkiyeyê rapor û nirxandinan amade bikin. Êdî di van nirxandinan de bi awayekî vekirî ji Tirkiyeyê tê xwestin ku ji bo kêşeya kurdî çareyeke siyasî bibîne, lewre her kesî jê derxistiye ku heta ev kêşe çareser nebe Tirkiye nikare gawekê bi pêş de biavêje. Heta siyasethanên biyan dewleta tirk bûye dîlê ve kêşeyê.

Wek mînak, kovara The Economist, di hejmara xwe ya 8-14'ê pûşperê de bi navê "Sêva zêrîn" nirxandineke dirêj li ser Tirkiyeyê amade kiriye. Di vê nivîsê de pirsgrêkên sereke yên dewleta tirk wiha tên rêzkirin: Şer, rewşa mafên mirovan û hevderrexiyê butçeyê. Tê gotin ku Tirkiye ji bo dagirtina valahiye bi faîzên giran deynan distîne û îsal % 37'ê butçeyê wê li deynan û faîzên deynan biçe. Xuya ye ku arîşeya sereke şer e, ewên din pir hindik bi şer ve girêdayî ne. Jixwe nivîskarên kovarê jî ve yekê diyar dikin.

## Şerê ku nikare navê xwe bibêje

Li gorî nirxandina kovarê metirsiya parçebûnê di nav tirkên de reh vedaye. Lewre jî mafên kurdan ên bingehîn bi tirs ku wê bibin pêpêlûkên parçebûnê tê paşçavkirin û wan hemû hêviya xwe bi artêşê ve girêdaye. Dîsa tê gotin ku ev yek di nav kurdan de hestên neteweyî xurtir dike. Kovara The Economist ku taybetî jî aliyê kapîtalîstên mezînan ve tê xwendin, di nava vê nivîsê de beşeke taybet jî şerê li Kurdistanê re veqetandîye.

Di despêka vê beşê de tê gotin ku Tirkiye bi kabûsa parçebûnê dijî. Li gorî vê nivîsê, dewleta tirk ew tirs ji dîro-

ka parçebûna împaratoriya osmanî ya sedsalên 18 û 19'an wergirtiye. Di nivîsê de ev tesbît cih digire: "Hemû gotinên rayedarên dewletê heta derekê rast xuya dikin. Ev der jî sînorê rojhilat e. Dema mirov derbasî rojhilatê Tirkiyeyê dibe û rewşa gundên şewitandî, çolên bêmirov û koltîkên li dor bajaran dibîne menzere diguhere. Ew menzere tiştine ji gotinên ku mirov li Enqereyê dibihîze cudatir dibêje. Diyarbekir dişibe bajarekî di bin dagirkeriya leşkerî de."

Nivîs gotinên zilamekî navsalî pêş-

## Cezayê kuştinê milyon û şeş sed hezar e

Parêzerekî malbatên ku lêzîmên wan bi destê hêzên dewletê hatine kuştin ji nivîskar re qala bûyera xortekî 14 salî dike. Navê wî Yusuf Kılıç bûye. Tê gotin ku Yusuf Kılıç ji bo girtina masiyana çûye ber çemê Dicle, li wir bi destê hêzên dewletê hatiye kuştin. Li ser cendekê wî derba 50 berikî hebûye, lê hêzên ewlehî tu tişt nekirine. Li ser vê yekê malbata Kılıç li dadgeha sivil doz vekirine. Dadger bi tenê leşkerek jî ber bêdîqetiyê sûcdar dîtîye. Ew bi 2 salan

ri agahiyên wezîrê karê derve yê Tirkiyeyê di sala 1994'an de ji 1194 dozên ku li hêzên ewlehî hatine vekirin bi tenê 15 hebî bi cezakirinê encam dane, di sala 1995'an de jî ji 962'yan 20 hebî bi vî rengî encam daye.

Nirxandina li ser Kurdistanê ya kovara The Economistê bi çend gotinên li ser dîroka kurdan û nakokiyên di nava civaka kurd de dom dike. Şerê PKK'ê wekî dûmahîk gelek şerên di dîroka kurdan de tê binavkirin.

Nirxandin, nêrîna rayedarên tirk a li ser Kurdistanê serbixwe, bend û qedexeyên li ser kurdan û çavlêgerandîneke li ser dîroka PKK'ê dom dike. Derbarê qedexeyê li ser zimanê kurdî ew mînak heye, karsazê kurd Nevzat Bingöl ku xwediyê kanaleke televizyonê yê binecihî ye, ji ber ku bi kurdî çend stran dane weşandin, doz lê hatiye vekirin, lê niha dewlet qala kanaleke bi kurdî dike. Nivîs qala agirbesta ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan daxuyandiye jî bi bîr dixê.

Li gorî îdiaya nivîskar PKK'ê dev ji marksîzm û lenînîzmê, her wiha jî dev ji doza serxwebûnê berdaye. Her wiha nivîs li ser sedema agirbestê jî nirxandineke bi nakokî dike. Li aliyekî dibêje, "dibe ku sedema vê yekê windakirina hêza leşkerî be, lewre heta 5 sal berê PKK'ê dikaribû artêşa tirk nexa gelek herêmên Başûrê Rojhilat..." Li aliyê din diyar dike ku kirinên dewletê piştigiriya ji bo PKK'ê zêde dike. Rast e bi roj hikûmet kare rîyan kontrol bike, lê bi şev kes gava xwe navêje derve. Mirov li herêmê li televîzyona peykê ya PKK'ê temaşe dikin. Partiyekê ku doza kurdan derdixe pêş li herêmê bi rêjeyekê mezînan rayan distîne. Heke kurdên koç kirine çûne rojavayê Tirkiyeyê jî dengê xwe bidin vê partiye ewê

## Rapora Human Right Watch'ê bi daxuyaniyên ji devê rayedarên dewletê eşkere dike ku çawa projeyên wekî "Projeya gundên navendî", "Li gundan veşerandin" û "Projeya ji nû ve avakirina Başûrê Rojhilat" vala derketine. Her wiha di raporê de wekî sedema valakirina gundan "ziwakirina avê li ser masiyana" tê diyarkirin.

kêş dike, ku çîroka gelemperî ya koçberan tîne zimên: "Ez mirovekî dewlemend û birûmet bûm li gundê xwe. Her roj ez li nav erd û zeviyên xwe digêrim, ez kêfxweş bûm. Li vê derê em li qatê çaran ê avahiyekê dimînin, cihê ku em lê dimînin bi sê menzelan e, em deh kes in. Kar bi dest min nakeve, bi tenê jin dixebitin. Ew jî diçin inatotê (daneheva pembû) yek ji wan rojê bi buhayê dolarekî pere qezenc dike. Ew yek dide zanîna ka em çawa dijîn." Li ser pirsê "Ge-lo PKK'î jî mirovan dikujin, gundan wêran dikin?" Heman kes vê bersivê dide: "Ew bi tenê cerdevanan dikujin. Ew li xwarekê dixwazin, heke gundî nedin bi zorê jê distînin. Lê ew gundan xera nakin, bi tenê cerdevanan dikujin."

hatiye cezakirin. Paşê cezayê wî zivîrandine ser milyonek û şeş sed hezar cezayê pereyan. Ew jî di nava du salan de divê bê dayîn.

Malbat jî aliyê leşkerên din ve hate tehdîtandin da ku zêde bi dû doza xwe nekeve. Li gorî parêzer di nava deh salên dawîn de li dora 2-3 hezarî bûyerên bi vî rengî qewimîne. Parêzer diyar dike ku gelek caran malbat kuştinên hêzên dewletê tînin, em ji dozger dixwazin ku ew dozê veke, lê ew dibêje: "Ev karê PKK'ê ye, tiştêkî zêde ku em bikin nîn e. Zêde bi pey nekevin, hûn nikarin tiştêkî bikin." Gotina parêzer a bi rengê "Dadgehên leşkerî karin leşkerekî ji ber ku botên xwe paqij nekirine ceza bikin, lê ji ber kuştina sivîlan tiştêkî nakin" di nava nivîsê cih digire. Li go-

li hilbijartinên bê de, bendê derbas bike û nûnerên xwe bixe parlamentoyê.”

## Heta şer hebe, xêra GAP'ê jî tune

Rayedarên dewletê GAP'ê wekî xelasîya gelê kurd nişan didin. Tê gotin ku ev proje wê ji 3.5 milyon kesî re derfeta kar peyda bike. Lê Rêveberê Komeleyê Karsazên Herêmê Nesim Sevinç bersiva van gotinan wiha dide: “GAP çi ye? Piraniya elektrîka ku ji bendavên vir tê hilberandin wê biçe ji Rojava re. Aliyê projeyê ku wê Rojava jê sût wergire, dimeşe. Lê aliya ku Rojhilat jê sût wergirin bi zorê dest pê kir.” Li gorî Nesim Sevinç hikûmeta navendî cudatîyê dixê navbera herêman. Li ser GAP'ê di encamê de ev nirxandin tê kirin: “Dibe ku gelê herêma sûtê wergire, lê ancax piştî ku şer qediya.”

Li gorî nirxandina The Economistê hin karsazên tirk jî çareserîya siyasî dixwazin, heta hin rayedarên artêşê jî gihîştine vê encamê ku serkeftina leşkerî di vî şerî de ne pêkan e. Nirxandin bi reqemên resmî dide zanîn ku tevî agirbestê jî şer gur e.

## Ji bo fetisandina masiyan gund tene valakirin

Li aliya din rêxistina mafên mirovan Human Right Watch (Çavdêriya Mafên Mirovan) di 10'ê pûşperê de li ser gundan ku hatine valakirin raporek amade kir. Di vê raporê de dewleta tirk bi îhlalkirina gelek zagonên navneteweyî yên wekî Konvansiyona Cewreyê



(1949), Konvansiyona Ewrûpayê ya Maf û Azadiyên Bingehîn (1953) tê tawanbarkirin. Her wiha tê gotin ku hêzên dewletê xala 125'an a Zagona Bingehîn a Tirkiyeyê jî didin bin piyan.

Rapor ji devê rayedarên tirk dide zanîn ku 2685 gund û mezra hatine valakirin. Rapor dibêje ku li dora 2 milyonî koçber hene. Rapor bi daxuyaniyên ji devê rayedarên dewletê êşkere dixe ku çawa projeyên wekî ‘Projeya gundên navendî’, ‘Li gundan vegerandin’ û ‘Projeya ji nû ve avakirina Başûrê Rojhilat’ vala derketine. Her wiha di raporê de wekî sedema valakirina gundan “ziwakirina avê li ser masiyan” tê diyarkirin.

Rêxistina Human Right Watch pê-

niyaz û daxwazan pêşkêşî dewleta tirk, PKK'ê, NY, Amerika, Yekîtiya Ewrûpayê û Konseya Ewrûpayê dike.

## Pêşniyazên ji bo Tirkiyeyê

Li Başûrê Rojhilat li gorî zagonên mafên mirovan operasyonên xwe bimêşîne; heke valakirina gundan ji ber sedemên ewletiyê pêwîst bû, can û malê gundiyan bide parastin; dema rewş guherî, bihêle ku gundî vegezin warê xwe; zera rên wan tazmîn bike û ji bo ku mirov karibin dozê xwe ragihînin, dadgehê alînegir bide vekirin.

Hêzên ewletiyê ku bi qestî rêzik û qeydeyan didin bin piyan bidarizîne û ceza bike; komîsyoneke serbixwe bide

avakirin da ku listeya gundên ku hatine valakirin tevî sedemên valakirine tesbît bike; her wiha divê ev komîsyon agahiya li ser kesên koçber tevî cihê ku jê ne û cihê ku lê dimînin diyar bike. Divê dewlet tazminatê bide hemû kesên ku hatine koçberkirin; bi mebesta alîkariya van mirovan komîsyonekê bide avakirin. Rê bide rêxistinên navneteweyî wekî IKRC û UNHCR'ê li herêma karê alîkariyê bide meşandin.

## Pêşniyazên ji PKK'ê

Girêdayî zagonên navneteweyî bimîne û êrişî sivilan meke. Hemû tevgerên ku dibin sedema valakirina gundan wekî êrişên li ser gundî û cerdevanan bide rawestandî.

## Daxwazên ji DYA, YE û KE'yê

Ji Tirkiyeyê bixwazin ku van pêşniyazan pêk bîne; çavdêriya rewşa herêma bikin; hemû firotina çekan û alîkariya ewlehî ya ji bo Tirkiyeyê bidin rawestandî, heta ku binpêkirina mafên mirovan dawî lê hatiye.


Daxwaza ji Neteweyên Yekbûyî. Nûnerê Taybet ê Sekreterê Giştî ku li ser koçberên hundirîn pişpor e bişînin herêma, da ku lêkolînan bike.

Xuya ye ku bi tenê PKK'ê daxwaza wê rêxistinê berî raporê aniye cih û agirbest îlan kiriye. Ev rêxistin tevî ku wekî berê ji PKK'ê bi terorîstiyê sûcdar nake jî, qala agirbestê nake. Ev yek wekî helwesteke neyînî balê dikişîne.

SAMÎ BERBANG

## Zanîngeha Kurdistanê medrese (6)

CELALETTİN YÖYLER



Medreseya Kurdistanê çawa û çima hate girtin? Medrese, bi dîroka xwe ya kevn her tim bi xwedîkirin û xebata gelê kurd di Kurdistanê de bi pêş ve çûye û tu demê neketiye bin bandora komara Tirkiyeyê, perwedetî û xebata xwe, di nav gel de bi taybetî di nav gundan de daye meşandin. Ji ber ku medrese neketiye bin bandora rejîmê; her tim bûye armanca tîr û êrişên wê yên hovane. Nemaze di heyama “Serkomartî û serokwezîrtî” ya İsmet Paşa de.

Di wê demê de zebtiyên rejîmê êriş dibirin ser medreseyan Kurdistanê û pirtûkên wan û egalên wan dişewitandin, hem jî xwendina li medreseyan qedexe dikirin. Lê gel, seyda û feqî li ber xwe didan, têkoşîna xwe li hemberî wê stemkariyê didane meşandin.

Ev zordariya hanê li ser merdresiyê gelo çima dihate kirin? Ez neşas bim, ji bo du tiştan, yek ji bo ku ronakbîr, gelperwer û welatparêz pirî wan di wê demê de ji medresiyê ne. Wekî serokatiya serhildana seydayê mezin û zana, (Şehîdê nemir Şêx

Seîdê Pîrani); lewre ew zanyar û seydayekî heja û mezin e û ji muntehiyê medreseya Kurdistanê ye. Ne ew bi tenê, di beriya wî de hinek zanyarên din jî hene ku di nav têkoşîna rizgariya neteweyî de ji seydayên medreseyê ne, wekî Seyîd Tahayê Nehrî. Wî zanayê mezin jî serî hildabû, ji bo rizgariya neteweyî ya gelê kurd.

Egera duduyan: Ji diwariya rejîmê li ser mederesiyê, pêşvebirina xwendin û zanîne li Kurdistanê nedixwest. Dixwest ku kurd bêxwendin û zanîn bimînin û di nav komarê de xwe winda bikin û bihelin. Lewre di wan deman de ji bilî xwendina medreseyê tu xwendinên din bi taybetî li Kurdistanê tune bû. Bi dû re dibistan hatine amadekirin.

Bi zanîna min pêkûtiya li ser medreseyê her ji bo van ramanên hov bû, ne ji ber ku di medreseyê de dersên olî dihatin dayîn. Lê ew çepel bi wan pêkûtiyan bi ser neketin û nekaribûn ku medreseyê bigirin. Ji ber ku stemrariya li ser gelan, her tim dibe egera niirîn û hêrs û berxwedana wî gelê bindest; çawa ku îro em li ber çavan dibînin, êrişên hovane li ser gelê me tînin kirin û malên wan tîne şewitandin, zarokên wan tîne girtin û kuştin. Lê ew li hemberî dijmîne mirovahiyê, bêtirs li ber xwe didin.

Lê hema tavilê Adnan Menderes û Celal Bayar û Süleyman bi rovîti û durûtî dest danîn ser medreseya Kurdistanê û ew vemirandin. Wisa vemirandin ku hê jî agahiya piraniya gelê kurd jê tune. Wan durûyan

sazûmanên olî ji binî ve xistin bin fermana kemalîzmê û bîr û baweriya (ideoloji) ya fermî. Di zagona xwe ya bingehîn de ji bi xaleke taybetî dabûn diyar kirin ku komara wan laik e, ango dewlet û ol ji hev cuda ne. Eger, ji dil bûna diviyabû ku sazûmanên olî bi serê xwe bûna, ne ku di bin bandora bîr û baweriya fermî ya dewletê de bûna. Lê em dinihêrin ku kirin û gotinên wan hev nagirin û durû ne.

Bi vî awayî digotin em laik in, lê dibistanên imam xatibê vekirin û melayên Kurdistanê xistin bin fermana xwe û ew kirin karmendê komarê. Ji bo meletiyê ji mecbûriyeta diplomayê derxistin. Bi vî awayî meletî û medrese bi hev re ji welatê me rakirin. Lê kesên nezan jî digotin meleyen me dev medreseyê berdane û naxebitînin. Qet nizanibûn ku durûyên rejîmê bi planên xwe yên siyasî medrese dane girtin.


Wekî durûtiya wan a îro ku li aliya dibêjin ‘em dewleteke laik in’, lê sazûmanên olî serbest bernadin û ji xwe û rejîma xwe re dixebitînin, li aliya dibêjin ‘em dewleta gelekî misilman in û di civinên ji bo aleva misilman de jî, serokatiyê dikin. Lê gelo îro çi ne? Îro jî ji bo ku, ji bin ve ûrta gelê Kurdistanê biqelînin, bi cihûyan (yahûdî) re hevaltiyê dikin. Misilmanên me yên durû îro ev in.

Gotina dawî, gelê kurd û meleyen medrese negirîne, rejîma kemalîst ew girtine.

# Şêx Sêîd: Ez bi torinên

## xwe re li ser çiya me

A. Melik Firat



**Di nav kurdan de, eşîrtî û ji hev cudabûn bûye sebeb ku, cînarên wan ên ereb, faris û tirk bi wan bilfizin û hebûna wan, jixwe sebebê cudabûnê ye. Lê ku sebebek ew be, ya din, sebeba muhîm ew e ku di nav me de xayîn hene. Ji du sed salî vir de, mirov li kîjan hereketa kurdan bimeyzîne, dibîne ku xiyanet bûye sebeba şikestinê.. Yên ku di nav hereketê de cih girtine, bi hev re xiyanet kirine.**

Hefê û du sal berê, Şêx Seîd Efendî tevî 47 hevalên xwe ku tev serek û giregirên kurdan bûn, ji aliyê dewleta ropo ve li bajarê Amedê bi sêpiyan ve hatin daleqandin... Wan ji bona xelasiya neteweya kurd, ji bona serxwebûna Kurdistanê dest bi têkoşinê kiribûn, lê çî heyf ku bi serî neçû, têk çûn, maxlûbiyet çêbû...

Cumhuriyeta tirkan dewleteke tîran e, zalim e... Ev dewlet ji terefê siyonîst û emperyalîstan ve hatiye daçikandin. Di bin emrê wan de bû; quwet ji wan digirt. Bingeha vê dewletê, zîlm û îstîbâd e. Li Ūris jî ihtîlala komunîstiyê çêbûbû, wan jî alîkarî dan kemalîstan.

Şêx Seîd Efendî, bi hevalên xwe ve çî wezîfeya ku ket ser milên wan bi cih anîn, lê yên ku li Ewrûpayê, yên ku li zanîngehên tirkan xwendibûn, bi piranî wezîfeya xwe bi cih neanîn. Hereketê ji ber xwe negirtibû, bêwext dest pê kiribû. Sabote bû, têk çû...

Di nav kurdên me de, hê jî fikra neteweyî bi cih nebûbû; eşîrtî, axatî û şêxîtî bûbû mîna sebebên îxtîlafê. Meseleyeke gelekî zor bû. Yên ku wezîfeya serokatîyê dabûn Şêx Seîd, ji şexsiyeta Şêx Seîd, ji minewertiya wî, ji dewlemendiya wî dabûnê. Yanê ew dinyadîtî bû, ji aliyê aboriyê ve rewşa wî baş bû û meseleya neteweyî jî dizanibû...

Şêx Seîd, di teblîxên xwe de digot: "Ev hezar sal e ku em li ser vî erdî bi tirkan re dijîyan, dîne me û baweriya me yek bû, erf û adetên me nêzîkî hev bûn, mustereka di navbeyna me de îslamiyet bû. Madem ku ev rejîma ateîst, kemalîzmê rabû îslamiyet avête aliye-kî; êdî em kurd bi serê xwe dewleta xwe ava bikin. Em jî, li ser erf û adetên xwe kamûraniya xwe biajon..."

Ji ber ku zivistan bû, dest bi hereketê nekîr, li benda biharê ma. Ji Xînûsê derket. Ji mezinên kurdan re name dişandin, wê civîneke dorfireh çêbikirana û hê qerar bîstandana. Hê cewab ji namayên wî re nayên, dewleta tirkan bi provokasyonêkê hedîseyê diteqîne. Alîkariya emperyalîstên Rojavayî jî girtibû û çî sosyalîst û çî mûhafezekarên tirkan hebûn, bûn yek û piştî Mustafa Kemal girtin...

Teşkilat tune bû, bêorganîzasyon bûn. Gelek tişt bi serê xwe çêdibûn. Ev

bû sebeb ku hereket zû şikestinê bixwe. Hîna Şêx Seîd di halê teblîxê de bû, pêşiya wî hat girtin. Gelek xwendekar û yên ku li ser wan wezîfeyên muhîm hebûn, mîna Xalid Begê Cibrî, ku bi xwe mezinê eşîrekî bû û di harbiyeyê de xwendibû, mîralay bû; hê di serî de tevî Ziya Yûsif û Hacî Mûsa Beg hatin girtin...

### Xiyanet li ber pêşveçûnê, kelem e

Di vê hereketê de ji bona zarokên me, ji bona neteweya me hedîseyên muhîm hene, gerek e bizanibin û ji xwe re îbretê bigirin. Di nav kurdan de, eşîrtî û ji hev cudabûn bûye sebeb ku cînarên wan ên ereb, faris û tirk bi wan bi-

lîzin û hebûna wan, jixwe sebebê cudabûnê ye. Lê ku sebebek ew be, ya din, sebeba muhîm ew e ku di nav me de xayîn hene. Ji du sed salî vir de, mirov li kîjan hereketa kurdan bimeyzîne, dibîne ku xiyanet bûye sebeba şikestinê... Yên ku di nav hereketê de cih girtine; yan bira bi bira re, yan pismam bi pismamê xwe re, yan jî law bi bavê re xiyanet kiriye... Sebeba maxlûbiyetê ev e. Di hereketa Şêx Sed de jî, ev bi eşkere tê dîtin.

Sertof (yuzbaşî) Qasim mûhafîzê Şêx Seîd bû û ku ew di nav kurdan de bi navê Qasoyê Xayîn tê naskirin, pismamê Xalid Beg bû û zavayê wî bû, xwişkeke wî li balê bû, xwişkeke wî jî li ba Şêx Seîd bû. Wezîfeyên muhîm

dabûnê, lê ew bi nameyan bi Mustafa Kemal re ketibû têkiliyê. Di dawiyê de jî ew Şêx Seîd dide dest. Xayîntî û xiyanet li ber pêşveçûna kurdan bûye kelem!.. Lazim e em vê yekê telfîz bikin.

Hereket bi girtina Şêx Seîd Efendî netemirî; deh-panzdeh salî dewam kir. Li ser çiyên herba gerîla hate meşandin û di nav van salan de belkî ji sed hezarî zêdetir insanên me hatin kuştin...

Grûba ku bi Şêx Seîd re mehkeme kirin, gelek kes bûn û 49 kesan cezayê îdamê girtin, lê du kes îdam nekirin (Qasoyê Xayîn jî bi wan re mehkeme kirin, pişt re ew sirgûnî Bodrumê kirin).

### "Riya min, riya milletê min û dîne min e"

Bi şev, di destê sibê re wan dibine Derê Çiyê, li Amedê. Ewîl Şêx Seîd li ser kursiyekî didine rûniştandin û temamî hevalên wî li ber çavên wî bi dar ve dikin... Pişt re ku dor tê wî, hakimê Îstiklal Mehkemesiyê ji bona ku wî li ber mirinê biceribîne, ka wê ji mirinê re çî reaksiyonê bide nîşan, jê re "Şêx Efendî tu dixwazî tiştêkî binivîsînî?" dibêje. Dema kaxîz û qelemê tînin, piştî bi erebî "Bismillâhîrrahmanîrrahîm" dinivîsîne, ewîl du ayetan dinivîsîne. Meala wan ev e: "Ji wan ê ku di riya Xwedê de tînan qetilkirin re nebêjin mirî, ew dijîn, hûn wan nabînin."

"Em ji Xwedê hatin, careke din ber bi Xwedê ve diçin."

Pişt re jî wiha didomîne: "Hûn li ser van darên bêqîmet min bi dar ve dikin, perwa min ji van daran tune. Riya min, riya milletê min e, riya dîne min e!"

Paşê ku kirasê îdamê lê dikin, destê wî girê didin, li bin dara sêpiyê jî bi kurdî "Ez dê niha ji heyata fanî derkevim! Dawiya heyata min hatiye! Ez jiyana xwe, di riya milletê xwe de, di riya dîne xwe de didim; pê mûteesîr nîn im. Memnûn im! Ji vir û şûn de, torinên min li miqabilî dijmin, mehcûb nabin!.." dibêje.

Yek ji wan 47 kesên ku îdam kirin, Şêx Şemsedîn bû. Cesedê wî dabûn xwişka wî, ew birin Qamişloyê. Derê Çiyê bû goristana 46 şehîdan...

Û lazim e mirov behsa çapemeniya wan î bênsaf û zalim jî bike... Xortên me yên ku bi siyasetê ve eleqedar dibin, îro jî dibînin ku çapemeniya wan çawa çepê rast didine nîşan û rastê jî çep. Dema mirov rojnameyên wan ên wê demê dixwîne, mirov ecêbmayî, matmayî dimîne. Wisa didine nîşan ku, wekî ku ew kes tev cahil û nezan û qatîl bin... Halbûkî ew gişt xwendekar bûn, alim bûn, beg û axa bûn; di nav





● 28.6.1925

Şêx Seîd û 47 hevalên wî hatin daleqandin. Piştî têkçûna serhildana ku di 13'ê reşemiyê de dest pê kiribû, Şêx Seîd û 47 hevalên wî li Amedê li Meydana Çirayê ji aliyê rejîma kemalîst ve hatin daleqandin.

● 26.6.1945

Avabûna Neteweyên Yekbûyî (UN), Piştî Şerê Cihanê yê Duyemîn, ji bo ku di navbera dewletên şerûd de careke din şer çenebe û li rûyê cihanê aşîr pêk were ji aliyê 51 dewletî ve û bi rêberiya Amerîkayê hate damezirandin. Neteweyên Yekbûyî bi awayê fermî di 24'ê kewçêra

1945'an de hatiye avakirin û ji van şaxan pêk tê:

Konseya Ewlekariyê, Konseya Aborî û Civakê, Dîwana Dadê ya Neteweyên Yekbûyî, UNESCO (Rêxistina Perwerdehî, Çandî û Zanistiyê ya Neteweyên Yekbûyî), UNICEF (Fona Alîkariya ji bo Zorokan a Neteweyên Yekbûyî).

● 25.6.1994

Kurdistanîyên li Ewropayê bi navê "Meşa ber bi Kurdistanê" li bajarê Almanyayê li Frankfurtê bi beşdariya 150 hezar kesî meşeke mezin pêk anîn.

AWIR

milet de îtibara wan mezin bû, lê çapemeniyê ji milletê tirk re, ew biçûk didan nîşan, mîna cahilan, mîna hovan... Û îro ji ku dinya ev çend biçûk bûye jî, dîsa wisa ne; mirovên bişeref û namûs li ba wan pîs in, lê diz û pûşt û pêzewengên wan, mezin û biîttibar in!.. Ev qereqtera rejîmê ye.

Ev dewlet wisa wehşî ye ku, li mirovan were xezebê, ji kevçiyên bigirin, heya beroşê, heya cilikên li ser mirov jî digire, difiroşe... Niha çawa ku gundan dişewitînin, însanan tazi û pêxwas diavêjin derve; ev usûla wan a qedim e...Sê caran mîna pêta agir, mîna tofan û aşîte bi ser malbata me ve hatine û tu tişt ji me re nehiştine. Çi menkûl û çi xeyrî menkûl, çi bi dest xistibin talan kirine... Diya min tim ev digot: Piştî şkestina herekete di malbatê de jin û zarok tenê dimînin. Birayê min î mezin Şêx Emer, di dergûşê de bûye, ez wê wextê tune bûme. Ku esertên malê, çi heye hildidin dibin... Dergûşeke ji texteyê dimîne. Ji texteyên beredayî. Di Xînusê de

berberek hebûye, rojekê tê birayê min ji dergûşê derdixe, dergûşê hildide dibe... Ku diya min "Lawê min! Tu çima dibî? Sibê me sirgûnê dikin, em li ser berfê diherin... Ev dîsa ji te re dimîne..." dibêje, berber li diya min vedigere, bi gotina "Anê, paşî yekî din dibe, ji min re namîne..." bersiva diya min dide. Miletêkî ku mexlûb bibe, bindest bikeve û perîşanî pê bikeve, ehlaqê wî jî xera dibe...

**Ji vê rejîmê zalimtir nehatiye dinyayê**

Par li Amedê em deh-panzdeh kes roja îne ji mizgeftê derketin, ji bona zêde nebe qelebalix, me xeber neda kesî, em çûn cihê ku şehîdên Kurdistanê lê meftûn bûn, ji wan re fatiha bixwînin. Me bi xwe re 46 gul biribûn...

Dera ku Şêx Seîd û ew şehîdên din lê meftûn in, erdekî rast e, bêgor û bêmezal

e, kes nizane ku ew der goristana şehîdên Kurdistanê ye. Nivî di nav beçxeyê Ordûeviyê de ye, nivê din jî Halkevi, lê Halkevi hilweşandine. Li hinek cihan giya şîn bûbû û komek ji kevir, hinek jî şûseyên araqê (reqî) hebûn...

Ez pir mutesîr bûm. Eger ev Diyarbekir welatê ermeniyên, welatê cihûyan bûya, yê roman, yê îngilizan jî bûya; wê bigotana li vî erdî hinek kesên ku ji bo welatê xwe şehîd ketine radikevin; wê ji wan re mezal çêbikirana, li dora mezalan wê diwarek lê bikirana... Li welatê ku

tirk tê de hikumran in û Amed ku merkeza Kurdistanê ye, şideteke wisa heye ku xelkê Amedê (welatparêz in, baş in jî) nikarin werin diwarekî li dora vê goristana şehîdên xwe lê bikin. Nikarin werin li ser wan şehîdên xwe fatihayekê bixwînin. Çer gemariyêke ecêb e...

Di wê esnayê de ez pir mutesîr bûm. Wer dilê min teng bû, çavên min tijî bûn ku, êdî wê hêstirên min bihatana xwarê, dengê hat guhê min, dengê Şêx Seîd... Ji min

re got: "Mutesîr nebe, megirî! Ez di bin vî erdî de nîm im. Ez ne di bin vî erdê mezbe de me. Ez li ser çiyayên Kurdistanê me û torinên min bi min re ne!..."


Piştî wî dengî, ew giraniya dilê min, ew kul û kedera dilê min firiya, mîna ku qet tu tişt nebûbe, wer sivikahiyek, cesaretê hate min... Me gul danîn, fatiha xwend û em vegeriyan.

Tiştê îbret ew e ku, ji vê dewleta ropo, ji vê sistema kemalîzmê zalimtir nehatiye dinyayê û nayê jî... 72 sal derbas bûye, lê hê jî mîna mezbe ye. Mirov û pîsmamên hinek ji wan şehîdan jî, li Amedê hene, lê nikarin ji ecdadên xwe re fatihayekê jî bixwînin. Ev tenê bi serê xwe şidet û dehşet û wehşeta vê rejîmê, barbariya vê sistemê îspat dike. Ji vê mezintir îspat tune, yanê mirov çi bibêje kêr dimîne... Divê mirov here bi çavên xwe bibîne.

**"Ez dê niha ji heyata fanî derkevim!  
Ez ji yana xwe, di riya milletê xwe de,  
di riya dîne xwe de didim; pê mutesîr nîm im. Memnûn im!  
Ji vir û şûn de, torinên min li miqabilî dijmin, mehçûb nabin!..."**

*Şehîd nemir e wek çiya  
Wekî berf û wekî dar  
Wekî gulebax û wekî bihar  
Şehîd Ceng e.  
Di salvegera şehadeta wî ya sêyem de,  
wî û hemû şehîdên Kurdistanê bi bîr tînin.*  
(1970 – 1993)


**Li ser navê hevalên wî  
ji Girtîgeha Aydinê  
A. Kahar Aksoy-Soydan Akay**



Ceng (Metin Akdağ)

ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YÎÇÎT



Wesfên grevên salên dawî û destkeftiyên wan

Reva birçibûnê çekeke siyasî ye, çekeke hemdem û demokratîk e. Ev çek bi taybetî bi berxwedan û berxwedanvanên zindananê Kurdistanê, Zîdana Amedê bi firehî û bi îsabetekê tamam ketiye jiyana me kurdan. Ji awira welat û derveyî welat, hejmara kesên ketine nav grevê bi vî firehî û bi vî dirêjahiyê, greva tîrmeha (temûza) sala bihurî û greva îsal ya pûşperê (hezîranê) xwedî cih, mane û giraniyêke xweser in.

Helbet berê jî, ji 12'ê rezberê (îlonê) û bi vir de çî li welat û çî li derveyî welat be, kurd ketine grevên birçibûnê û dest avêtine vî çeka demokratîk û fedekar.

Belê grevên van her du salên dawî grevên herî bikêr, herî dengdar, herî Kurdistanî û neteweyî ne. Cara ewil di van her du salan de bi awayekî nebûyî, ji giş parçe, herêm, zarava, mezheb û dînî, ji Kermanshahê heta bi Qonya û Heymanayê, ji Rûsyayê heta bi Awusturalyayê, ji Sikandinavyayê heta bi Sicîlyaya kurd di van grevan de tên ba hav, dil û mêjiyê xwe dikin yek û bi dengêkî diqîrin, di govendekê de direqisin, di eynî meydan an jî avahiyê de xwarinê naxwin û dilê wan bi hev re lê dide û mêjiyê wan konsantreyî ser yek tiştî dibe.

Ev grev, êdî ne grev û ne bi tenê xwarin nexwarin e. Grev bûye xwendegeh û qerargeheke perwerdekariyê, hişyarî û organîzebûyîna neteweyî. Di nav van grevan de mirov bi dehan sal bi pêş dikeve, ji qirêj û gemara dagirker û dijminan tê şûştin, kurdîr, humanîstîr û mirovhezîtir dibe, bi qedr û buhayê berxwedanê, tehb û xwêdanê dihesê û bi dil û mêjiyê xwe li gel, zindanê, gerîla û şoreşa welatê xwe nêzîktir dibe.

Di van grevan de her wiha hezkirina welat, bendewarî û evîna azadiyê, geş û gur dibe û dibe qereqterekî temendirêj û daîmî. Û helbet tiştên ku ev grev ji gel û deshilatdarên cihanê, rêxistin û dezgehên navneteweyî û mirovhez re jî dibêje, zehf in.

Grev vî dibêjin: Binêrin û bibînin em kurd ji ku hatine ku, em êdî ne ew kurdên belengaz û bêtifaq in, ne jî ew kurd in ku we digot "goka agir in, ji kê re lazim be digire û diavêje yê din, êşkere bikêrêgirtî ne, ne ji xwe re ji xeyrê xwe re xizmetê dikin". Grev yekê din jî dibêjin: Bi çavên xwe bibînin em çendî aşîxwaz in û dewleta tirk jî çendî militarîst, xwînrêj û dirinde ye.

Divê bê gotin ku ev fedakarî, yekîtiyê, tifaq û hevgerîna ku di ser sînoran re diqevize, bi xwîn û xwêdanê çêbûye. Li vir pişka şehîdan, şehîdên Zîdana Amedê, şehîdên serê çiyân û nav bajarên cihê serekî û yekemîn digire. Dîroka van 15–20 salên dawî bûye dîroka berxwedan û şehadeta. Di van salan de kewanê şehîdên me dirêj bû û bi dereca vî dirêjbûnê, gelê me çavên xwe vekir, ji xewa Eshabilkehf hişyar bû, xwe nas kir û organîze bû. Di van salan de dinya û mirovayeti bû şahidê gelek mîrxasiyên mezin, rojên birûmet û dîrokî li Kurdistanê.

Rûmeta roj û salên bihurî û mîrxasî û berxwedanên li pey me man, bûne rêxweşkirên îro û zemînamadekarên sibehê. Salên li pêş û wêbêyê jî, dê bibin salên kurdan. Mes, tempo, fedakarî, derece û nisbeta xizmet û karê heye, li xwe û li hev xwedîderketina kurdan li hundir û li derve, li Kurdistan û li metropolan nîşan û berjengên rojên hê xweştir, dem û demsalên hê bîmanatir û hê serbilindtir in. Ev roj mirov xurt dikin, germ û geş dikin, zewq û hewesa xebatê ne bi tenê han didin, radikin çargavan, dixin pîkolê.

Ev roj, rojên tûjbûn û seqabûna mêjî û hişmendiya mirovê kurd e. Dijwarî, serêş, bûyer û qewmandin çendî zêde bin, sêl çendî sincirî be û dijmin çendî xezebêrêj û xwînrêj dibe bila bibe, salên 2000'î salên kurdan in. Berê me li tengasiya bi dû firehiyan de ye. Ya zor û zehmet ya heta niha bû.

# Xebata me ji bo çareyan e

Di destpêka salên 1990'î de bi serhildanan re gelê kurd dest avêt xebata legal jî. Niha HA-DEP wekî nûnerê têkoşîna legal a gelê kurd xuya dike. Berî komcivîna giştî yê vê partiyê, hevalên me AYNUR BOZKURT û JÊHAT SERHENG li ser gelek mijaran dîtinên Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak standin. Divê bê gotin ku Bozlak cara yekemîn bi kurdî daxuyanî da rojnameyekê.


11'ê Gulana 1994'an, me HA-DEP ava kir. Ji bo demokrasiyê, ji bo aştiyê, ji bo mafê mirovan, ji bo meseleya kurdan me dixwest ku çareyan bibin û di van waran de em bi pêş de herin. Lê belê hevalên me hatin kuştin, heta vêga 13 hevalên me şehîd bûn. Wexta me partî vekiribû, nedihîştin ku kes bînayên xwe bi kirê bidine me. Li bajaran jî teşkilatên me, wexta dixwestin avahiyê ji xwe re bigirin, polîs diçûn xwediyê avahiyê tehdît dikirin.

Ji ber vê yekê jî me ji bo navenda partiyê 6-7 meh cih nedît. Heta yek ji wan kesan ku cihê xwe wê bida me, paşiyê hat û gote me, "Welehî, ez ji we re rastiye bibêjim, ez ji partiya we gelekî hez dikim, piştgiriyê jî didim têkoşîna we, divê gelê kurd jî mafên xwe bi dest bixe. Lê hin kes hatin ba min, ez tehdît kirim. Ji ber wê jî ez nikarim cihê xwe bidime we."

## Hevalên me tu car jî têkoşîna nerevîyan

Rasterast zor didan ser gel. Ne tenê ev. Mesela me dixwest ku şahiyên çêkin, gel bînin ba hev, lê musade nedikirin. Partiyên din ji xwe re bi rihetî mîting û şahî çêdikirin, civîn çêdikirin, lê astengî derdixistin ber me. Gelek ji hevalên me digirtin bin çav, îşkence li wan dikirin, tehdît dikirin da ku ji partiyê veqetin. Di van şertan de hevalên me bi azîmeke mezin xebitîn û tu car jî têkoşîna nerevîyan. Her tim li ba me cihê xwe girtin. Lê dîsa jî gelek hevalên me ceza xwarin, hin ji wan ketin hundir, hin ji wan derketin derve û karê xwe, ji mecbûrî di cih de hiştin. Di şertên îro de hevalên ku ceza standine nikarin bibine endamên partiyê. Belkî mirov dikaribû zêdetir tişt bike, têkoşîna baştir bide, lê di şertên îro de anca ew qas çêbûn.

Di 23'ê vê mehê de komcivîna me heye. Heta di ber komcivîna li bajaran, li navçeyan me kongreyên xwe çêkirin. Heta niha 37 bajaran kongreyên me te-



mam bûn. Delegeyên komcivîna jî hatin hilbijartin. Niha ji xeynî delegeyên li 37 bajaran, hinek jî delegeyên me yê komcivîna yê xwezayî hene. Tevî wan, bi temamî 768 delegeyên me hene. Delegeyên me tev diçûn vê komcivîna. Em dixwazin komcivîna me bi germahî û baş derbas bibe. Ji bo cihê jî "Atatürk Spor Salonu" hatiye girtin. Em dixwazin gelê me giştî werin, desteka xwe bidin partiyê. Daxwaza me ew e ku komcivîna me ne mîna ya partiyên din çêbe. Partiyên din ji bo ku mirovekî xwe li cihê bi cih bikin, dikevin kêşmekêşiyê. Em dixwazin bi vî rengî nebe. Çûnkî pirsgerêkên me mezin in; meseleya kurdan, meseleya demokrasiyê, aştiyê, mafê mirovan, meseleya karker û kedkaran, meseleya jinan, ciwanan û hwd.

Li gorî îradeya delegeyan ev komcivîna wê çêbe. Em bi vê komcivîna orxanên xwe ji nû ve hildibijêrin; Navenda partiyê, Serokê Giştî, Heyeta Dîsîplîna ya Navendê, Yedeka wê û hwd. Her endamê me heqê wî heye hem ji bo serokatiya giştî, hem ji bo cihên din bibe berendam. Li gorî demokrasiyê jî ev lazim e. Hevalên me yê ku heta niha dixebitîn, ji bo van tiştan xwedî huner in û he-

qê wan jî heye.

## Kî rind xizmetê bike, ewê were hilbijartin

Armanca me jixwe ne şexs e, armanca me ew e ku; kî dikare vê têkoşîna baştir bidomîne, kî rind xizmetê bike, kî rind politikayê bike, ewê were hilbijartin. Ev 6-7 sal in em di vî warî de ne, her kes, her kesî nas dike. Berê mîlet hevdu pir nas nedikir, lê êdî her kes dizane ka kî dixebite, kî naxebite. Bawerîya min heye ku delegeyên me wê tiştê herî rind bikin.

Ji bo serokatiyê jî, ev 2 sal e ez li serokatiya partiyê me. Li 23'ê vê mehê jî wezîfeya min temam dibe. Heger heval careke din wezîfeyê bidine min, ez vê ji bo xwe mîna şerefê hesab dikim û piştî 23'ê mehê jî ezê vê wezîfeyê bidomînim. Heta niha ji min bêhtir navê hin hevalan derket, lê kesek hê bi awayekî resmî nehatiye partiyê, da ku berendamtiya xwe diyar bike. Navê hin hevalan di rojnameyan de derketin. Lê ew jî hê nehatin. Heta komcivîna wext jî heye. Delege eger rayê bidin, wê were hilbijartin û hevalên din jî tev bi hev re, wê vî karî bidomînin.

## Bi dijberên sistemê re îmkana îtifakê heye

Organîzasyona hilbijartinê (Blok Aştî, Azadî û Ked), me tenê ji bo hilbijartinê çênekiribû. Me dixwest ku çepgirên Tirkiyeyê yê ku ne li parlamentoyê ne, rewşenbîr, nivîskar, sendikayên hem karker hem jî kedkaran, komeleyên alewiyan, komeleyên mafên mirovan, yanê kî jî vê sistemê nerihet be, em giş werine ba hevdu, ji bo ku em hêza xwe bigihînin hev û tev bi hev re têkoşîna bidin. Em difikirin ku tevî wan kesan meclîseke hevpar çêkin. Çi problem hebin em tev bi hev re çareser bikin. Lê ev tişt heta vêga nebû. Heta me dixwest ku em di nava partiyekê de bibin yek, lê îmkana vê tune. Îmkana yekbûnê tune, lê îmkana îtifakê heye. Piştî hilbijartinê BSP'ê xwe fesh kir û kete nav ÖDP'ê. DDP jî hate girtin. SIP û em man. Lê piştî komcivîna em dixwazin ku vê yekîtiya berfireh pêk bînin.


## Rewşa 'Nûnerên Gel ên Bijartî'

Di hilbijartina giştî ya 95'an de, 23 hevalên me li herêmê hatibûn hilbijartin. Gel rayên xwe dane wan. Lê ji ber benda %10, neketin meclîsê. Lê gelekî neheqî çêbû. Niha gelê Amedê ray dane me, lê ji ber ku yê Yozgatê nedane me, hevalên me yê Amedê neketin nav parlamentoyê. Niha me got madem ku gel bawerîya xwe bi hevalên me anîne û raya xwe dane, divê ew jî layiqî bawerîya gelê xwe bin; ji bo wan xizmetê bikin. Hingê me heval top kirin û me got, emê jê re bibêjin Nûnerên Gel ên Bijartî. Ew hevalên me dem bi dem tene ba hev. Carcaran daxuyanî jî dan. Alîkariya me jî dikin. Me dixwest hinde aktif, hinde baş çêbin, lê ji ber probleman, ku ev problem ên partiyê ne jî, zêde tişt çênebû. Mesela destnedaniya (dokunulmazlık) wan hevalan tune ye, mîna mebusên din nikarin bi rihetî bigerin û bixebitin. Lê di nav partiyê de em tev bi hev re dixebitin. Înşallah ji vir û şûn de emê bi hevalan re bêhtir bixebitin.

Têkoşîna ku em didin ne ji bo hilbijartinê bû. Hilbijartin ji bo me talî ye, karekî din e. Armanca me ne mîna partiyên din e. Ha ketin meclîsê, ha neketin, ev ne muhîm e. Tenê divê problem çareser bibin. Em ji bo vê dixebitîn. Eger armanca me mebusbûn bûya, ne di nav HADEP'ê de, di nav partiyên din de, me yê cihê xwe bigirta û emê bûbûna mebus.

Niha li Tirkiyeyê bi awayekî resmî anketek çênekirine, lê li gorî texmîna me 20 milyon kurd hene. Partiya me jî desteka xwe ji kurdan distîne. Mirovên biyan jî hatin ji dewletên din, gotin: "Hûn ketin hilbijartinê, lê kurdan ray nedane we." Kurdan esas ray dane me. Li herêmê tu partiyên din ji bajarekî





komple ji sedî 47, sedî 50 ray nestandin. Ev hêzeke, destekeke mezin bû. Ew qas zor û tehde hebû. Gel tehdît dikirin. Digotin "raya xwe nedin HADEP'ê." Li gundan mudaxele kirin. Heta mudaxele-yî sandokan jî kirin. Eskeran sandok birin navendê, li wan deran vekirin. Heta li gundan ew rayên ku gel dabûn me şewitandin.

Li metropolan netîceyeke baş demaket. Sebebê vê jî pir in. Em partiyeke ecer (nû) in. Partiyên din ên ku dikevîne hilbijartinê, ên herî ecer partiya 30 salî ne. Partiyên 50 salî hene. Mesela DYP ji 1946'an pê ve propagandaya xwe dike, CHP heye ew 70 sal e, Partiya Erbakan RP, 30 sal e dixebite. Ê me jî cara yekemîn e ku em dikevîne hilbijartinê. Carekê HEP'ê bi SHP'ê re îtifak çêkiribû, wê nehesibîne.



### Gund li ortê tune, neqil ji ku bîne!

Li gorî texmîna min li Tirkiyeyê 7-8 milyon hilbijêrên kurdan hene. Jixwe gelek ji wan jî qeydên xwe çênekiribûn. Milet cihê xwe, şûna xwe terk kiribû. Li herêmedî jî koçbûn hebû. em jê re dibêjin koça hundirîn. Ji gundan însan hatine bajarên, an jî kesên ku înkana wan hene hatine metropolan. Dema hilbijartinê jî ew însanên koçbûyî nikarin herin cihên xwe û raya xwe biavêjin. Dema kesên ji gundan koçbûyî ji bo qeydê diçin, ji wan re dibêjin, divê tu belgeya neqlê binî. Ê gundê însanan şewitiye, wê belgeya neqlê ji ku bîne. Gund li ortê tune, kes tune!

Li metropolan jî wisa bû, qeydê wan tune bû. Mesela hevalekî me li Stenbolê di otobuseke mitîngê de ji 80 kesî pirsîye, ji wan 8 kes qeydkirî derketiye. Ji 80 kesî 8 kes! Lê di mitîngan de bi me re bûn. Wan kesan qerara xwe dane jixwe,

her tim bi me re ne. Dewletê ev tişt bi zanebûn kirin. Însanên me li derveyî hilbijartinê hiştin.

Min got armanca me ne tenê ketina meclîsê bû. Ha, dema hevalên me bike-tana meclîsê wê têkoşîna xwe li wê derê jî bidomandana. Lê ne rast e ku mirov bifikire ku, "ne di nav parlamentoyê de be, nikare têkoşîna li derve bide." Çunkî li her derê, tu dikarî têkoşîna xwe bidomîn.

### Girtî, ji bo mafê mirovan li ber xwe didin

Însanên me yên ku li girtîgehan in, ne tenê di dewra wê hikûmetê de, ji berê ve heta ji 1980'yê û vir ve di vî halî de ne. Polîtîkaya dewletê; dixwaze ku kesên li hundir in ew teslîm bigire. Meqset ew e

**E** m ji pirsgirêka kurdan re li çareyeke demokratîk digerin. Çunkî bi vê zordariyê, bi vê şîdetê û bi qeweta eskeran ev problem çareser nabe.

ku ew kesên li hundir, dema ji wir derkevin li derve azîma wan a têkoşîna nemîne.


Ev polîtîkaya dewletê ye. Niha girtîgeh bi temamî girêdayî wezîrtiya edaletê ne. Ê şexsiyeta Mehmet Ağar belî ye. Vî çî îş kiriye, gel giş dizane. Mehmet Ağar bû wezîrê edaletê, polîtîkaya berê ya şîdetê, ya zorê zêdetir bû. Vî kesî, hat nehat mudaxele-yî girtîgehan kir. Jixwe girtî eger teslîm bûbûna ji berê ve wê teslîm bûbûna. Mesela hingê qanûna îtirafkariyê derxistine. Ev însan teslîm nabin, bi azîm in, bi bawerî ne. Li hemberî neheqiyê li ber xwe didin.

Ew hevalên li girtîgehan ne dîrî me ne. Tev zarokên me ne. Çi bi wan bê, bi canê wan bê, di eynî demê de te canê me jî. Daxwaza wan ji bo mafên mirovan in, demokratîk in. Em piştgiyê didin têkoşîna wan jî. Ha wekî partiye me çî kir? Me dest bi greva birçîbûnê kir, ji bo piştgiyê. Me jî bi qasî ku ji dest me hat

hewl da xwe ku talebên wan werin qebûlkirin. Ji xeynî wê jî, ji bo malbata girtiyan, me cihê xwe bi temamî vekirîye ji wan re. Di binayên me de grev dikin.

### Rewşa îro ya Tirkiyeyê

Tirkiye dema çû hilbijartinê krîz gelekî mezin bû. Bi hilbijartinê wisa difikirîn ku partiye bihêz werin û koalîsyonekê çêkin û çareyan ji pirsgirêkan re bibînin. Ev nebû. Piştî hilbijartinê RP bû partiya yekemîn. ANAP û DYP bûn partiye duyemîn û sêyemîn. Ev ne li gorî daxwaza wan bû. Kêfa wan jê re nehat. Piştî hilbijartinê jî îro jî wezîfe ji Erbakan re hate dayîn, lê tu partiyan bi RP'ê re li hev nekir û neketin hikûmetê. Çima neketin? Niha ANAP ji Erbakan û ji fik-



**E** ra wî pir aciz e? An jî DYP ji fikra Erbakan pir nerihet e? Na! Tansu Çiller dema diçû meydanan, digot "Ezan, Quran!" Yanê wî jî dinê gel bi kar dianî, îstismar dikir. Ê baş e, çî nakokî heye di nav wan de?

Nakokiya wan; li Tirkiyeyê kesên ku hêza siyasî di dest wan de ye, naxwazin Refah bikeve nava hikûmetê. Ne di seriyê hikûmetê de, ne jî di navê de. Hikûmeteke bê Refah dixwaze. Yekî din jî, hikûmeteke muheqeq bi DYP'ê dixwaze. Ji ber wê jî nehiştin Refah were hikûmetê, bi DYP û ANAP'ê dan avakirin. Feqet vê koalîsyonê jî ancax sê mehan demam kir û zêde neçû. Bi hevdu re îdare nekirin. Ji vir û şûn de jî li hev nakin. Serokên wan ketine hevdu. Lê Güreş jî dibêje, "hûnê tevî hev bibin. Ku hûn tev hevdu nebin, hûn dizanin berê çawa bûbû. Yanê hevalên min wê li we bixin." Ji ber wê jî ew mecbûr in, gotina wan kesên ku hêza siyasî di dest wan

Armanca me jixwe ne şexs e, armanca me ew e ku; kî dikare vê têkoşîna baştir bidomîne, kî rind xizmetê bike, kî rind polîtîkayê bike, ewê were hilbijartin. Ev 6-7 sal in em di vî warî de ne, her kes, her kesî nas dike. Berê millet hev pir nas nedikir, lê êdî her kes dizane ka kî dixebite, kî naxebite. Baweriya min heye ku delegeyên me wê tiştê herî rind bikin.

de ye, bikin. Dixwazin vêga ev her çar partî werin ba hevdu, lê nayên ba hev. Niha ew werin ba hevdu jî tu çare ji pirsgirêkan Tirkiyeyê re nikarin bibînin. Nikarin hikûmeteke biîstikrar ku saleke du salan biajo çêkin. Texmîna min ew e ku, ew ancax dîsa ji xeynî Partiya Refahê, ji partiye din hikûmetekê çêkin. Wê bi qasî salekê vê rewşê îdare bikin. Tirkiye bi vî awayî dîsa salekê winda bike.

Li Tirkiyeyê problema herî muhîm û mezin meseleya kurdan e, lê ji bo meseleya kurdan tu tişt neguheriye, eynî polîtîka dewam dike. Mesela agirbest hebû, tu kesî negot, "Wa ye agirbest heye û ev fersendeke mezin e." Di ser de, operasyonan dikin û dîsa ketin Başûr. Yanê zihniyeta wan, polîtîkaya wan a esasî neguheriye. Niha tiştê ku dilê mirovan rihet bike û mirov bi hevî bike,

**E** m dibêjin heta ku meseleya kurdan çareser nebe, Tirkiye nikare meseleyên din çareser bike. Ev mesele, problema Tirkiyeyê ya herî muhîm e.

tune. Her ku diçe rewş xerabtir dibe. Hikûmeteke nû ku bi Refahê jî çêbe, nikare probleman hel bike. Wê dîsa herin hilbijartinê.

### Dema ez çûm mektebê, min bi tirkî nizanibû

Wexta ku ez li rojnameya Welat dinêrim, dixwînim lê bi temamî jê fêm nakim. Eger yekî ku kurmanciya wî baş be, bixwîne û ez guhdar bikim, ez giş fêm dikim. Kurmancî hatiye qedexekirin, nehiştine em bi zimanê xwe bixwînin, binivîsinin lê, ev ne tiştê zor e. Ez dixwîzim her kurd bi zimanê xwe hem binivîsin, hem bixwîne. Wexta ez çûm mektebê, min bi tirkî nizanibû. Hin kelîmeyên tirkî me dizanibûn, lê em li mektebê hînî tirkî bûn. Divê em giş bikaribin bi kurmancî hem bixwînin, hem jî binivîsinin. Ev ne îşekî zor e. Eger em serê xwe biêşînin, emê di 5-6 mehan de bi ser bikevin.

## Dengbêj Alî Tîco:

## Hunermend zana û dadger e

**Mijara muzîka min gilî ye, dilşewat e.  
Lewre em bi her tiştê xweş û şîrîn  
dihesin, lê destê me nagihê,  
qedexe ye ji bo me. Çima çav dibîne,  
lê dest nagihîje?!**

**E**m dikarin Alî Tîco nas bikin, ew kî ye, ji ku ye, niha çi dike, li ku dijî? Bi kurtî, me dikarin agahdar bikin?

– Ez hunermendekî kurd im, kurê cotkaran im. Ji başûrê rojavayê Kurdistanê me. Çêbûna min di sala 1930'î de, li şarê Efrînê ye. Xwendin û nivîsandina min tune. Em di malbatê de pênc bira bûn, ez yê biçûk im.

Hunermendî Îlham e, lewre tiliya Yezdanê pak tê de heye... Ez lewma bûm helbestvan. Niha ezê şerê çar demên salê (demsal) ji we re pêşkêş bikim:

*Buhar, reneki şêrîn e,  
gul û kulîkên deviya bişkivîne.  
Seysin û gul, rihan û nêrgiz,  
didin bîn e.  
Ma çima ez pê şa nabim?  
Çimkî di pê re havîn e,  
Ew nêrgîza,  
rengê şêrîn dişewitîne!  
Rêşî û pelên daran diweşîne.  
Ji havînê re ji namîne,  
toz û kulxana payizê,  
baskê wê dişkîne.  
Çar wextê salê,  
tim yek li dijî yekê sekinîne..  
ji wî hawî ez bûm Dilbirin e*

### Dayika min ez bi hêstiran dikirim xewê

Çawa we dest bi hunermendiyê kir, ez bawer dikim we bersiva vê pirsê da, lê dîsa jî tiştêkî din ku hûn bixwazin wekin û di malbata we de wekî din hunermend hebûn?

– Di malbata me de wekî din hunermend tune bûn. Min huner ji diya xwe girt. Lorandina dayika min li ser zarokan pir xweş bû. Bi hêstiran ez dikirim xewê. Tê bira min dermanê xewa min dengê dayika min bû. Ez bi dengê xwe car caran ditirsandim, digot tu nese kinî ezê bilorinim (belkî ne lédan bû, lê girtina dil e, saw e). Heta digot dikarim nehêlim kes gundî şivê çêke, bi dengê xwe.


Lewma ez bûm dengbêj. Bi gotinê şîrîn û bi dengê şîrîn... Ew sedem e bûm tembûrvan....

*Cara pêşî dema we dest pê kir nêzîkbûna gel çawa bû, rewşa we çi bû?*

– Hingî huner ne gelekî merxûb bû.. heta gel hunermendî şerm didît, fêm nedikirin lewma nedibû cihê guhdarkirinê. Perdeyeke reş xistibûn nava xwe û wî cewherê xweş. Lê ez nese kinim heta niha. Sal bi sal guhdar zêde bûn.

*Em dibînin tu tembûreke xweş lédixî, gelo hûn bi xwe fêr bûne, yan hinekan hûn fêr kirin?*

– Lorandina min got, ji diya min bû. Ez pê hesim



gerek tembûreke hebe. Gava min bibihîsta ku li filan gundî an li bêvan gundî yekî tembûrvan heye, ez rast diçûm. Şanî min dikir, zêdeyî xwesteka min dida.

*Mijara muzîka we bi tevayî çi ye, çima?*

– Mijara muzîka min gilî ye, dilşewat e. Lewre em bi her tiştê xweş û şîrîn dihesisin, lê destê me nagihê, qedexe ye ji bo me. Çima çav dibîne, lê dest nagihîje?!

### Cihên gotinan ji birînên çekan xerabtir in

*Bi dîtina we, kîjan strana we bandora xwe pir bû li ser gel?*

– Tu cudabûne nikarim bixim nava stranên xwe. Her ku gel hişyar bû û tégihîşt, bi birîna xwe hesiya, pê ve hat girêdan. Ancax vê pirsê ji gel bikî, gerek e gel nav lê bike, kîjan xweş e. Birîn tenê ne bi çekan vedibe, cihê gotinan ji birînên çekan xerabtir in. Bi gotin û zimanê xwe me xwest derman bikin, wê birîna stemkariyê ya bijehr.

*“Ey welato” yek ji strana te ya bi nav û deng e. Kengî û çima te ew stran afirand?*


– Min guhdarî dîrokvanan dikir, digotin em xwedî welat in. Welatê me jî bizilm û zorê ji me birine. Ew tev zîv û zêr e, dijmin di nav de dijî û em di nav ax û galopê de dijîn. Ew di nav xêr û bêrê de ne, em xwas û tazî ne, tî û birçî ne û bêxwedî ne, îcar dilê min agir pê ket. Ji gelê xwe re welat çi ye, di çi rewşê de ye? Min gazî gelê kurd kir pê.

Ji kevn ve ye. Wexta min pêşî got, gel têngihîşt. Lewma ancax heta salên şestî deng da, yanê mirov dikare bibêje heta welat hat naskirin ji aliyê gel ve. Mirov dibîne, ew tiştê gel guhdar nedikir îro ji bo wê didin can û xwinê.

*Mamoste, berî têkoşîna rizgariyê ya nûjen, kesên bi muzîkê re mijûl dibûn biçûk dihatin dîtina di civakê de, bi we sedema vê yekê çi bû?*

– Yek ji bo ku gel tê nedigihîşt, razayî bû bêguman? Ji aliyekî din ve hişyarbûna neteweyî li cem hunermendan mabû, lewma ji bo ku ew tu rolê di hişyarbûna gel de neleyizin, neyar ew li ber çavê gel reş dikirin. Ez dikarim ji jiyana xwe mînakekê bidim:

Gava gel hinekî ji stranên min fêm kir, dewletê ez bi zorê bi xwe re dibirim, xwarin didan min, bi xwe re digerandin li ber çavê gel... ji bo ku dilê gel ji min



Li Navenda Çanda Mezopotamyayê (MKM) ya Stenbolê şaxê Beyoğluyê ve heftiyê ev çalakî pêk tên.

● 23.6.1996 Yekşem

Govend ji komên NÇM'ê, Koma Serhildan, saet: 14.00

● 26.6.1996 Çarşem

Semînera İsmail Gölbaş, li ser "Di nav kurdan de birêxistinî," saet: 18.00

● 28.6.1996 Ğn

Ji beşên NÇM'ê beşa Hunerên Dîbariyê, film: Armanca Asî, saet: 18.00

● 29.6.1996 Şemf

Konsera Koma Gulên Xerzan, saet: 14.00

Konsera Gulbahar, saet: 18.00

Li BEKSAV'ê jî ve heftiyê ev çalakî hene.

● 26.6.1996 Çarşem

Şano ji komên BEKSAV'ê listika "Em nûçeyê jî ku bidin", saet: 18.30

● 27.6.1996 Pêncşem

Konsera muzîkê, Gîtar, flût û koroya telebeyan. Ji komên BEKSAV'ê, saet: 18.30

● 28.6.1996 Ğn

Konsera Gurup Munzur, saet: 18.30

## RÛDAN

sar bibe, baweriya wan bi min nemîne.. û li min guhdar nekin. Van provokasyonan berdewam kir heta derketina serokê neteweyî. Wî rastî derxist, listik derxistin holê...

*Wekî tê zanîn gelê kurd ji muzîkê hez dike... çima?*

– Gelê me ji parêzerên nediyar hez dike. Muzîk yek ji parêzerên kurdan e. Derman bû... Doktorê ku destê xwe datanî ser birînen kurdan...

### Huner miriyan sax dike

*Huner çî ye ji bo mirovan?*

– Huner guhê gel vedike, dihêle mirov bi xwe bihese... derdê xwe; birîna xwe bibîne. Nexweşan rihet dike, razayiyan hişyar dike, rê nîşan dide... Keran bi guh dike, yê kor bi çav dike. Huner bi kurtî miriyan sax dike. Huner şerê hebûnê ye.

*Hunermend kî ye, her kes dikare bibe hunermend? Yanê bi awayekî din her kesê dengxweş hunermend e?*

– Hunermendî îlhameke xwezayî ye. Hunermend ew e ku xwe nas dike, kî ye... û ji dinyayê fêhm dike, dinya çima çêbûye. Hunermend, ê ku bi zor û zilmê dihesê; yê ku li mafên windayî dipirse. Hunermend, ê ku li dijî jehrê rawestiyaye. Hunermend, ê ku dizane di dinyayê de tiştê tewrî buha çî ye. Hunermend, ê ku ji tahl û jehra dinyayê tam kiriye... Ne wiha be, nabe hunermend...

Hunermend zana ye, hakim e, bi edalet û wicdan e... Şerm û fedî ye!

*Têkiliyên di navbera hunermend û şoreşê de çî ne?*

– Hunermend û peywirên wî, me li jordan xuyakirin, dubarekirinê gerek nabînin... Hunermend gav bi gav bi şoreşê re ye, bi hunera xwe ya wekî çekê şer dike, kaniya moralê ye ji bo şoreşê.

*Civaka kurd bi pêş ketiye, hatiye guhartin, pêwîstî bi muzîkeke nû heye û nûbûn di muzîka kurdî de tê çî wateyê?*

– Her tişt gerek e bingeh jê re hebe. Her stranek klasîkî çiyayekî bixwîn e. Çek hîn li erdê ne, xwedî jê re nîn e. Ê ku lingê xwe bi wî çiyayî nexê, deştê nabîne.

Di dinyayê de kaş ne tim berjor e, car caran berjêr e. Yanê stranên kurdî her yekê şewatek, şadiyek li cem e...

Bi min xezîneyên me pêwîst in hîn bîn kolandin. Ew kesên ku naveroka stranên berê bi gotînen vala diguherin, stranên diherimîn...

Ew qels in, perîşan in, xezîneyên xwe vala ne, lewre diziyê dikin, dizî şerm e.

Ew stranên klasîk li ser tiştêkî çêbûne. Xwediyê xwe hene, çima tuyê wî cewherî û xwediyê wî înkâr bikî. Îro gel ne razaye, hişyar e; dizane kî çî dike. An kîjan stran ya kê ye. Eger tu hunermend î, hunera xwe nîşan bide...

*Mamoste, bi kurtî ev gotin ji we re tên çî wateyê, an çî tîne bîra we: jîyan, hezkirin, welat, muzîk?*

– Jîyan: Jîyan bi xwe berxwedanek e, gelek tûj e, jehr e. Lê şîrîn e jî; di bin xebat û şer de ye.

Hezkirin: Rengê hezkirinê pir in. Berê me hezkirin û rastiya wê nas nedikir. Em yekser li pey hezkirina vala digeriyan, di ser hezkirina rastî re diqevizîn. Lê hezkirin di nav tirsê de, an ji tirsê nabe û hingî navê wê nabe hezkirin... Ancax mirovê azad, mirovê dîlşah mafê wî yê hezkirinê hebe, çimkî tama wê dizane!

Welat: Tiştê herî buha ye, bingeha jîyan, hebûn û hezkirinê ye. Her tişt bi welat ve girêdayî ye, lewre tunebûna welat mirov mehrûm dike ji her tiştî... Nîrxê (qîmetê) mirov bi hebûna welat ve girêdahî ye.

Muzîk: Riya jîyanê û hebûnê vedike, rê nîşanî mirov dike. Mirov pê xwe nas dike, bi muzîkê mirov dipirse çima em ji tiştê herî buha, ji azadiyê û mirovahiyê bi bi dîr xistine?

Niha jî ji kurdan re riya welat nîşan dike!

### Bila stranên klasîk neherimîn

*Pirsa me ya dawî bi vî rengî ye, ev demê hûn ji welat dîr in. Dûrbûna ji welat çî ye?*

– Ez xwe tune dibînim, wekî dara ku tu rihê wê ji cihê wê, ji axa wê qut bikî, lewre ew dar fêkî nagire û roj bi roj pelên wê zer dibin, diweşin û hişk dimîne. Mirov hîn bêhtir bi hesreta welat, xweşiya welat dihesê... Banga welat dibihîze... Berê jî welat bang dikir, lê em tê nedigihîştin kor, ker û razayî bûn.

*Heke gotineke we an mesajeke we, ji xwendevanan re, ji gel re hebe fermo bibêjin.*


– Ê ku muzîka wî bikeve serê min, li dilê min bixê, çî dost, çî dijmin ez keda wî wînda nakim û bextê xwe reş nakim...

Dijmin be jî çeka xwe ezê li hemberî wî rakim, lê keda wan tiliyên zêrîn, ew tiliyên ji zoq çêbûne, mafê wan wînda nakim.

HEVPEYVÎN: ÇEKDAR

## TÎŞK

SÎRWAN REHÎM



### Zarewekanî zimanî kurdî

Şairî neteweyîman Hacı Qadirî Koyî deferwê: Kitêb û defter û tarîx û kaxez/ Be kurdî ger binusraye zimanî/ Mela û mîr û şêx û padişaman / heta mehşer dema naw û nîşanî...

Ziman şademaî netewe ye, ziman birbirey piştî gel e, gelî bêziman kilol û çarereş in... Û zor şitî tirîş. Belê le eweş aşkira ye ke zor şitî tirîş der barey ziman û giringî ziman gutrawin û degutrên.

Gelo aya ême be gwêrey mebest awirman lem mesele giringe dawetewe...!? Aya ême wekû ferze qolî mebestman lêhelmalîwe...!?

Bêguman kêsman le we bêaga nîn ke dujmanî gel û neteweman çendê bo nemanî zimanî kurdîman hewliyan dawê û hewlîş deden û heta êşaş hewlekanyan berdewam e. Diyar e emeyan cêgey mijarî éstaman niye û bo hemuşman şitêkî belgenewîst û zelal e.

Belam xoman, êmey kurd, zimanzananî kurd çîyan kirduwe û dexwazin çî bo zimanî kurdî biken?. Zimanî kurdî sermayeyekî dewlemend le wişey rengawreng û xezneyekî pir le mirwarî ye, lê belê perj û bilaw, bêxizmetkar û xemxor e. Serbarî eweş em ro ke be hoy çendîn hoy ciyawazewe beşe ciya ciyakanî welat dest le milanî yek debîn û yek degrinewe, çend dengêkî naşaz berz debinewe û şitî seyir û semere û dîr le hizir û ramanî zanistî delên..

Hîç guman le we da niye ke, ta em ro le naw zarawe kurdiyekan da zarawey kurmançî jêrîn, ango soranî le hemwan geşekirdûtir e. Diyar e kes larî le we niye sibeynê xebatêkî wekû ewey bo soranî kirawe, bo zaraweyekî tir bikrêt geşe dekat û rengbê soranîş be cê bihêlê. Eme belgey dewlemendî ye bo zimanî kurdîman û deşbê be kolegey ew bin mîçey ke le diwaroj da yek kepir û sabatî zimanî yekgirtuman bo çê deken. Îtar seyr e û mayey gumanêkî mezin e soranêk be xoy bilê ziman zan û kurmançî ret katewe û kurmançêk dimilî ret katewe, yan pêçewanekanyan..

Xizmîne... Kesîne coge û cobarî kurmançî, dimilkî, goranî û soranî; menzilî sibeynêyan zeryay zimanî yekgirtuy kurdî ye û runtir û paqijtir lew amêze da wekû çawî qirjal xo denwênin... Ewsa Goran witenî;

Ewsa Xanî,  
Xanî serdem

Be zimanêk denusê mem  
Ke pêy dedwên Nalî, Mehwî  
Wek Qubadî, wek Mewlewî..

Kewate ba kesman fitway ewe nedeyin em zaraweye qels û ewî tiryar bêkelke, ciya lewey ewe boçûnêkî dîr le zanist e, hawkat dîjmanî neteweş be xoman xoş dekeyin...

## Di zargotina kurdî de

## rola dengbêjan

**d**ema mirov bixwaze li ser dîroka geleki lêkolînekê çêbike, mirov beriya her tiştî serî li berhemên nivîskî û bidevkî dide. Dema ew gel, ji aliyê berhemên nivîskî ve qels be, wê çaxê rola berhemên çirokî, zargotîni û hunerî zêde dibin. Tiştê balkêş ev e ku; gel û welatên ku dibin esareta dagirkeran de ne, nesibê xwe ji vê yekê gelek giran û xedar distînin. Her tim rastiya wan tê berevajikirin, çanda wan tê tunekirin, ew dibin xwedî çand, huner û dîrokeke biyan û nerast.

Belê; gelê kurd û Kurdistanê jî, ji ber ku bi sedsalan hatiye dagirkirin, zîmanê kurdan hatiye talankirin, heta îro jî, ji aliyê dîrok û berhemên xwe yên nivîskî ve an bêpar in, an ku hebe jî, wekî tiliyên destan kêmin.

Lê siûda gelê kurd, ji aliyê çand, huner û dîroka bidevkî ve vekirîye. Bi rastî ji zargotina kurdî geleki dewlemend e. Heger îro ne bi saya dengbêjiyê bûya, gelo emê ji şer û aştiya bav û bapîran; kiryarên beg, axa û şexan û mîrkujiyên eşiran bi çi awayî agahdar bibûna? An jî ne ji çirok û lorişkên dapîrên me bûna, gelo me yê şexsiyetên mîna Mîrze Mihemed, Keçelo, Kumreş û Koçero nas bikirana? Îro ji dema kesek bixwaze zîngûyên bixwîn û şikeftên tarî û şewitî hîn bibê, guhê xwe dide lorişkên dayikan. Ji aliyê din ve, gelê kurd di gotinên dengbêjan de îxanet û serkeftinê, bawerî û neçariyê bi awayekî zela dibîne. Lewre mirov di zargotina gelê kurd de, zayin û mirin, şin û şahî, ken û girîn, reşahî û ronahiyê bi hev re dibîne.

**Dengbêjiya Xerzan**

Dengbêjiyê, li çar aliyê Kurdistanê li hemû herêman, tesîreke cur bi cur û xurt kirîye. Lê ev yek li herêma Xerzan xwe zêdetir nîşan dide. Deşt Xerza, Qubîna şewitî, Hezoya kevin, Fileyên Koxa, Ezdiyên Hemduna, Xatmaya Xopan, Çiyayê Zenga, Bîra kurêdiya, çemên Başûr û Xerzan, germava Xêsta, û Billorîs, di kilam û şerên dengbêjan de ruh dibînin. Ev cih carina bişermî, carina jî birûmetî tene binavkirin. Şêxên Zoqeydê, Seyidê Badayê, Begên Eyndarê û Zoqê, çiyayiyên Motka û koçerên Miradî û Kanîgewrikê di devên wan de bûne benîşt û heta îro hatîne. Ji ber ku qismekî ji yana xwe li Mîsircê (Kurtalan), li çiyayê Zenga derbas kirîye û li wê derê li ser limêjê ji hêla jendermeyan ve hatiye kuştin. Koçeroyê Farqînî ji devên dengbêjên mîna Salihê Qubîne, Teyibo, Qasimê Qubîne, Zahiro û hwd. hîn bûne û dane hîn kirin.

Li aliyê din, şexsiyetên bi nav û deng mîna Hacî Zorav, Filitê Quto, Zibeyrê Ehmê, Cemilê Çeto, Derwêşê Sado, Silehedîne Hacî Reşid, Seyidê Mamo û şerên eşirên Mala Faro û Seyidê Badayê di nav berhem û gotinên wan de cihekî girîng digirtin

Ji dengbêjiya Xerzan du mînak

Ji devê dengbêj Teyibo

Şerê Smaîl Axa

Lo birano, lo birano, lo birano  
Lo heyla lê wayê...  
Lê Mehteberê nemînim lê wayê sibe ye.

Bala xwe bide tîpê siwara, kesekî mîna Reşo û Silo her du zarê ezîdiya  
Li hawar û îmdada Îsmail Axa, bavê Xosero reisê kurda nayê.

Agirê ku ketiye text û bayê Şahê Îranê

Tofana ku ketiye Kerbelayê  
Were birano, lo birano, lo birano  
Lo birano sibe ye, emê midiyarê qesr û qonaxê  
Îsmail Axa, bavê Xosero, reisê kur-

Mehmûd, Reisê Derwêş, Cindiyê Hacî  
Evan şerker û nertewana, bejn û bala xwe girêdan bi romanî  
Desta cilê şevê danî, berda rojê hilanî

Xwe berdane, her çar malên biniyê  
Gurek der û tê mala Dibo, ji kezêb-şewitiya xwe re anî

Xwe berdane Gorê Memîka, çemê komar û serbazno

Li warê Gundik şûnvan bû, derketi- ne quntarê çiyayê

Kolin, li pozê Zengayê Mamo, li hafa Deşt Xerzan kemîn danin.

Di tariya sibê de xwe berdane Çola

Dibo girtine palewanî.

Xasê, korê, ezê bi diyarê gava Zengayê Mamo diketim

Giran e, dengê sêzê tivinga her hilanî, şad û şûdê Bişarê Çeto

Bavê şevo gelek e, îro li gaza Çiyayê Kolik, li Zengayê Mamo

Di warê sinê de, li ser serê berxê mala Dibo kiriyê kafirstanî

Şad û şûtê Cemilê Çeto bavê Fere- mez gelek in.

Bi du denga gazî dike, Silêmano lo lawo ezê sed cara bi serê bavê xwekim, ezê îro vê yekê bi serê te binim, binêrka, tê tu cara talana kurê camêra, ji xwe re nebî bi mîranî

Şad û şûtê Ehmedê Îskan bavê Misto gelek in.

Bi du denga gazî dike, " Cemilo lo amo,

Ezê bi serê amê xwe kim, nîvedeka li dayê bejn û bala

Silêmanê Mistê, li koka mala Dibo, ji dinyayê danî."

Xasê digot, "Ebê lawo, min nizanîbû tu berx î, lo beran î

Binêre mala Dibo, kesek nema li vî banî."

Ehmedê Îskan, bavê Misto, nîşançiyê ser tivingê

Îro li tar û li çarçî li serê kekê te de anî.

Serê xwe di kozikê de derîne, şerê xwe bike bi giranî

Belkî Xwedê siûd û ehvalê ji te re li hev û du anî

Te heyfa Silêmanê Mistê, kula mala Dibo, bi destê xwe hilanî

Tana Ebê nanî, serê xwe di kozikê de deranî

Serê mîrato çardehiyê li ser kevirê kozikê danî

Derbekê lê dabû, bejn û bala Gêncoyê Çeto bavê dest bihene

Bi ser termê kekê xwe de anî.

Bi du denga gazî dikir Ehmedê Îskan digot: "Bavê Misto tu çawan î?"

Te digot: Ezê di Qesra Eynqîsrê de runêm. Pesn û wesiyetê xwe bidim, bêjim min talanê kambaxa Xatma

Bi kotek û dar û zorê ji pêşiya mala Dibo deranî anî.

Were ha dayê ha dayê, ha dayê....

Xasê digo Silêmano lawo şeveke giran li me diqewime, li gorê memîka, li çemê qumara, li warê quwluk, li çiyayê Kolik, Zengayê Mamo, li warê Silê, li hafa Deşt Xerzan la ho li tepe ye. Min di girane dengê sêzê tivinga Bişarê Çeto bavê Şelmo

Cemilê Çeto bavê Feremez, Ehmedê Îskan bavê Misto, bi tevî Silêmanê Mistê bavê Ezê, Gula mala Dibo, ji siba Xwedê ve di warê silê de oxirme ye. Ezê bêjim Bişar Axa bextê bavê te ketime tu pesn û wesiyeta xwe nedî, nebêjî Gêncoyê birayê min axa ye.

Bi potîn û qondere ye. Nebêjî Silêmanê Mistê ço bike çolê bi çarik û bi gore ye. Gurzikê ji wê eşra bi xwe re roja şerê Çiyayê Kolik, Zengayê Mamo, warê Silê.

Wile Silêmanê Gênco berdelê birayê te ye...

SALIHÊ KEVIRBIRÎ



da diketin,

Havîn e ji loman e, dinya germ e.

Li vê girane, eskerê Şahê Îranê, bi girina Teyaran e, bi gurmîna topan e, bi qêrina xweşkêşa, bi qijîna qûcûbçaba, firkûna qaşkûn û firara.

Esker giran e, ji siba Xwedê ve kişyane û hate ser me.

Smaîl Axa bi du dangan, li Reşo û Silo re, li her du zarê ezîdiya dikir gazî:

Digot: "Lawo ji me ra çêbin, çepka xwazîn dest hilînin;

Hunê bikujin yuzbaşiyên, binbaşiyên, generalan, nefer nekujin, nefer gunê ne, em eşir in ji navê me re şerm e...."

**Şerê Mala Faro (Cemilê Çeto)**

Erê ha dayê, ha dayê, ha dayê.

Xasê digot: Silêmano lawo min manî xweş neanî

Min dît Silêmanê Mistê, Brahmî

Xerzan lawo nêştewanî li talanê kambaxa Xatma dabû vê sibê

Ga û gamêşê Mistoyê Reşo zili tanî  
Were ha dayê, ha dayê, ha dayê.....

Xasê digo Silêmano lawo şad û şûtê Bişarê Çeto gelek e

Ew makulê pewledar e, li Qesra Eynqîsrê rûnişt û meclîs danî

Heyra wê teypê deyne wile te rihê wî deranî

Ra û şeranûşê xwe girêda.

Qerara kuştina Silêmanê Mistê, Brahmî Mehmûd, Rehisê Derwêş, Cindiyê Hacî, van xweşmêra ji ba xwe tanî.

Li Qesra Eynqîsrê berjêr bû bi giranî.

Birekî Zevrûsê mala Faro, ji kezêb-şewitiya xwe re hilanî

Gîşte pozê Xatma şewitî, rêçiya rê çê geran e.

Vê sibê rêç û tewş û çexerê Silêmanê min deranî

Xwe da quntaxa çiyayê Kolik, zengayê Mamo, di warê Silê de Gula Mala

# Xebateke azmûnerî: Adarê

Muzîk û kurd du tiştên wisa ne ku, bêyî hev qet nayên fiki-rin. Çi kesê biyan ê ku bi kurdan re têkili danibe, ew ji nêzik ve nas kiribine, ev taybetiya wan ditiye. Heta Lucian Rambout, di pirtûka xwe ya bi navê "Çağdaş Kurdistan Tarihi" (Dîroka Kurdistanê ya Hemdem) de gava taybetiyên kurdan diji-mêre, bal dikişîne ser vê yekê û dibêje: "Kurd ji strandinê zehf hez dikin."


Ji hêla din ve, ew li xwe mukir tê û dibêje: "Hîna jî dengê wan stranan di kerika guhê min de ye."

Di hişyarkirina siyasî ya gelê kurd de, rol û fonksiyona muzîkê êşkere ye. Heta mirov bi hêsanî dikare bibêje ku, di rakirina ser piyan a kurdan de jî, muzîk pêkereke (faktor) girîng bûye û ew rewş hîna jî berdewam e.

Ji ber vê yekê, xebat û guherînên ku tîst xwestin di muzîka kurdî de bîne kirin, divê bi awayekî zanistî bin. Gerek em ne girtî bin û kevnepereşt jî nebin. Ji guherînên rast û di cih de "belê."

Piştî ku me têkiliya muzîk û gelê kurd piçek şîrove kir, em bîst ser kasetê Koma Agirê Jiyan. Komê, kasetê xwe ya pêşîn bi navê "Adarê" derxist. Temenê komê sê sal e û ev kaset jî keda wê demê ye. Endamên komê jî ev in: Alî Geçimli (solo, vokal), Bêrivan Okçuoğlu (solo, vokal), Şener Yıldız (solo, vokal, gîtar) û Nail Yurtsever (vokal). Lê nehatiye daxuyandin ku kî kîjan parçeyî distrê.

Amûrên wekî bas gîtar, gîtar, keyboard, flût, baxlama, cûra, mey, zirne,



dahol, kabak kemane, û bendîr hatine bikaranîn.

Di "Adarê" de tevî hev 11 stran hene. Bi rastî mirov nizane bibêje çî, ji ber ku lîteratûra muzîka kurdî hîn rûne-niştîye. Em bibêjin stran, kilam an "parçe", li vir ez bi xwe jî bêbiryar im. Ji van 11'an şes jê gelêrî ne û bi awayekî pirdengî hatine strîn. Çar heb jî Herêma Serhedê (Girtî, Şemamê, Golê da, Gicilokê) hatine berhevkirin, yek jî herêma Xerzan (Çar yar) û ya din jî (Newalo) nehatiye xuyakirin ku ka ji kîjan herêmê ye.

Her pîncên din ku nû ne, sisê jê (Adarê, Dîlan, Nalîna Welat) yên Mah-

mut Yamalak in, yek jê (Reşan) ya Zahir Kayan û ya din jî (Bê bê) ya komê ye.

Ji yên nû, Nalîna Welat sirûd (marş) û Dîlan jî bi şeweya sirûdê hatiye çêkirin û strîn.

Strana "Adarê" ku navê xwe daye kasetê, ya herî xweş e, kom di vir de bi ser ketiye. Komê strana bi navê "Reşan" ew bi awayekî nûjen anîne zimên. Stran li ser "Reşan Demirel" e ku di Newroza 1992'yan de li Îzmîrê, li Qe-dîfeqaleyê xwe şewitandibû.

Komê teswîra pêtên agir di stranê de bi awayekî serketî pêk anîne, hilbûn û gurbûna agir bi hilbûna dengên xwe şayesandine (teswîr kirine).

"Bê bê", straneke bi zaravayê kirdkî (kirmancî) ye û ji aliyê komê ve hatiye çêkirin. Ji her aliyê ve ev parçe jî yên din cudatir e. Hewlên azmûnê (cerbînê) bêhtir xwe di wê de dane xuyakirin.

Digel vî qasî, kesê ku berê li xebatên Komên Navenda Çanda Mezopotam-yayê guhdarî kiribin li cudahiyeke werdiqelin. Ji aliyê strîn û bikaranîna amû-rên (hacetên) muzîkê ve, ev yek diyar e. Ji min re fikreke welê çêbû ku, tesî-ra komên çepên tirk li ser Agirê Jiyan çêbûye.

Li dawiyê em wê bibêjin, xebateke azmûnerî ya rindik e. Endamên komê ku hinek bala xwe bidine ser bilêvkirî-na kurdî jî wê baş be.

ZANA FARQÎNÎ

**Gava em bi awayekî giştî li vê berhemê binêrin, em dê bibînin ku xebateke baş û azmûnerî (tecrûbî) derketiye holê. Komê ji bilî awa, teşe, rîtm û meqamên kurdî, yên wekî pop, rock, blues û hwd. bi kar anîne. Kaset ji aliyê rîtm ve zengîn e, digel rîtmên sivik ên giran jî hene.**

**Digel vî qasî, kesê ku berê li xebatên Komên Navenda Çanda Mezopotam-yayê guhdarî kiribin li cudahiyeke werdiqelin. Ji aliyê strîn û bikaranîna amûrên muzîkê ve, ev yek diyar e. Ji min re fikreke welê çêbû ku, tesîra komên çepên tirk li ser Agirê Jiyan çêbûye. Li dawiyê em wê bibêjin, xebateke azmûnerî ya rindik e.**

## Firaze neynika pêşerojan e?

MEDENÎ FERHO



A rmanca zanistiyê, erka ser xwezayê ye. (1) Lê iro, rewşa ku cihan tê de ne wilo ye. Teknolojîya ku warê zanistiyê ye, bûye 'şûrê demokles' û di ser serê mirovahiyê re diheje. Bêguman, zanistî di bin karkeriya rastmaliyê, yan jî bazirganiyê de ye. Baconê din, yanê Francis Bacon (1561/1626) di destpêka rastmaliya Îngilistanê, tiliya xwe dirêjî wê pîrgirêkê kiriye. Îro jî, ne nêrînek û dîtînek kozmîk e ku bîr û bawerî di serê Xwedayê destbixwîn de bi potansiyelî, di serê komên xelkê yên bêguneş de bi pişeya rojane cihê xwe digire. Cihan her bûye çaryana tirata hespên zordestan. Dîrok jî bi destên wan çewt û li gorî daxwaza wan hatiye nivîsandin. Ji avrûyê re car caran qedirşinasên zanist û hunerî didine pêş, lê tu gotin û pêkanînen li gorî qedirşinasan nabin. Sezar û Skenderê Mezin û hwd. dibine mînak ji bo serdar û serkêşan.

Çima ne Ehemdê Xanî, Dostoyevski,

Beethoven, Schiller û hwd.?

Rewşa civata kurd ne wekî ya tu gelan e, di nav cudabûneke mezin û ecêb de ye. Tu mînak û çavdêrî ji gelên cihanê, rewşa civata kurdan nîşan nade. Helbet sedemeke bingehîn û dîrokî heye li meydane. Civata kurd bi tevayî ketibû qonaxeke eudemonîzmî. Yanê tevizandîneke pîr û kalî... Wîlo şikestî, stûxwar, korişkî, bêhêz!... Hûr û gir!... Zarok û mezin!... Jiyanêke misrî, qels û tîr qerqesûn... Her tişt ketibû nava hevûdin, bi kurtî jiyan ketibû nava avşolkeke lewitî û nava demûşeke zelîqoyî!... Civateke pîr û kal, westiyayî, bêhêvî... Ku ji kîjan hêlê ve hatibana rahiştin bêlome be!... Tovê waweyê derdikete hemberî mirov. Civat bi giştî, di jiyanêke berdewam de girêdayî serdar û rênasên derî xwe bû. Rekihek hesinî, bêderî, bêpâce hatibû honandin. Jiyanêke ku 'qetûlilleh' ber bi pozîtîfî gav nediavêt, her û her ber bi negatîfî diçû. Dawî bîra bêbînî û windabûn bû...

Di sendroma îdeolojî û politikayê de, hewn, yanê aqil cihê xwe bigire jî, bi ser nakeve, wê bikeve qonaxeke xas a madî. Heta dema ku hewn yanê aqil karbendiya xwe di hêla ronahiyê de û di xizmeta komên xelkê de bi xurtî neke, hêviyê nade.

Bila qeyd û şert, divê ku zanistî metodên nûjen bide bikaranîn û kevnariyên pûç ku kevz û pung girtine ji nava hestî û rayê laşê

civatê bête hilweşandin. Helbet, weke Bacon F. gotî, berheviya demjiyanên dîr û kûr di bikaranîneke rast û dirust de wê bibe neynik. Şaşî tî tune ye ku dibêjin nûjenî tune ye, her nûjeniyek di bingeha xwe de kevnariyêkê radigire. Lê, em nikarin li gorî zivirandina cihanê nemeşin û tevgera komên xelkê berçav nekin.

Helbet malbateke çand û civak û dîroka kurdan jî heye. Bêguman, ev firaze neynika pêşketin û tevliheviyê nûjeniyê ye. Lêgerîn û hewcehiya rojane, ya demsalan û xweza û karûbar ev rastî derxistiye meydane. Server Tanillî: Dîroka mirovaniyê bi berpêçûna civakî yanî komaleyê dide nasin. Mixabin ya me kurdan, wekî min li jor anî ziman di tîkçûneke ku bi destên Xwedayê destbixwîn hatî nivîsandin û qedereke windabûnê diyar dibe.

Îro, qonax berevajî ev qas dîtina e. Civata kurd bûye xwedî taybetiyêke din ku di warê nûjenî û hemdemî de bibe xwedî gotin û dîtina. Pîr û kalîtiyê cih daye ciwanî û xortaniyê...

Careke din em bibêjin: Li gorî dûvelenka rojê, stêrka balkêş, tîr geşî û xweşî cihana ku deng û awazên bilbil û şalûlan tevî qîrîn û axinên dayik û zarokan dibin û zivirandina wê, nûjenî û metodên zanistî pêwîst in. Helbet bi nêrîn û dîtina fraza bav û kalan...

(1) Roger Bacon, (1914-1992)

# Avisbûna mêrê pîra yewnanî



“Dildarê min, ronîya her du çavê min; rabe em zû ji vî welatî birevin, hîna ku tu avis nebûyî. Nexwe emê di nav hevalan de bihetikin, bicarisin, rezîl û riswa bibin.”

**L**i Stenbolê pîrek Girîfî, yewnanî hebû. Car caran ez diçûm mala wê; me pev re (bi hev re) bûbûn dost. Rojekê ji min pirsî got:

“Kurê min tu ji ku yî?” Min gotê ku ez ji Nisêbinê me. Nisêbîna li ser Mêrdînê. Min dît bû pufepufa wê û kenî. Min gotê:

“Dayikê bo çi sedemê tu dikenî?”

Got:

“Kurê min bibore ez ne bi te dikenim. Heyama berê, xortaniya min û kêmaqiliya min hate bîra min. Ez bi xwe û wê demê dikenim.”

Min got:

“Weke çi?” Dest pê kir û got:

“Ez qîzek yewnanî ji Girava Girîfê bûm. Hatim Stenbolê bi yekî rûm re zewicim. Mêrê min karmendê berevaniya gumrikê bû. Dû re mêrê min tayînî gumrika Nisêbinê bû. Em mecbûr man çûn Nisêbinê. Em her du xort bûn, zarokê me nîn bûn. Karê mêrê min jî li deriyê navbera Nisêbin û Qamişlo bû.

Rojekê ez ketim milê mêrê xwe, em diçûn cihê karê wî. Min çavê xwe li

derdora xwe gerand, hema bibêje pîrek nîn bûn, li sûk û kolanên nava Nisêbinê bi piranî zilam hebûn. Zikê wan mezin li ber devê wan bû. Tu nabe giştawî bûn. Fatreşka wan werimî bû. Min bi dizîka sedema wî zikê wan ê werimî ji mêrê xwe pirsî. Kenî û got lê nepirse. Min enîşkek li mêrê xwe da got, ez meraq dikim, ka ji bona çi zikê wan zilaman ev çend mezin e, tu dizanî; ji bo çi tu ji min re nabêjî?

– Got: Delala min, ma te nebihistiye?

Min got: “Na”

Got: “Dildara min, li vî welatî mêrê avis dibin, ne jin.”

Min got: “Bî rastî, niha ev zilam avis in?”

Got: “Erê.”

Min jê bawer kir û ze matmayî mam. Hem jî tirsiyam. Min jê re got: “Dildarê min, ronîya her du çavê min; rabe em zû ji vî welatî birevin, hîna ku tu avis nebûye. Nexwe emê di nav hevalan de bihetikin, bicarisin, rezîl û riswa bibin.

Î. OMERÎ

## XELAT...

## XAÇEPIRSA BIXELAT (23)

## XAÇEPIRSA

X	E	T	F
R E M Z Î K A R T A L			
Z Ü D E R R E			
M A G A B I J İ Ş K			
L I V B A Z İ E A			
H N A N İ I R N			
A G K A E			
A R A U E V			
Y A R M E T İ			
D A L İ K A N			

PEYVA VEŞARÎ → ZIKREŞ

### Bersiva Xaçepirsê (21)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 23'an kasetê Hozan Şemdîn “Ka Bûka min” e.

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nixandin, divê hûn “Peyva Veşarî” di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.




HOZAN ŞEMDÎN

Kesên ku xelata xaçepirsa 21'an, kitêba Musa Anter “Firat Marmara'ya Akar” qezenc kirine: Orhan Çabuk/ Ankara, Mehmet Kaplan/Izmir, Ömer İlhan/ Mardin, Fariz Güneş/ Seyhan, Tayyib Balka/Çatak, M. Selim Koçak/Buca, Sabahattin Halli/Erzurum, Erdal Medet/ Diyarbakır, Fehmi Süslü/Gürpınar, Seyfettin Söyler/Ş.Urfa


Çiçek Serokê Kubayê (wêne)	Damar Çavnebarî	Sembola Aktînyûmê Hêlin	Di notayê de dema seknê Navek	Besêke ziman TVya. fermî ya Tirkîyeyê	Bajarek li Japonyayê
					2
Lemîşt Liq	7	Sureyek ji Quranê	Hiri Damezrenerî		
		Yurtdaş Qerl. henek		Baneşane ke bangkirinê	
Enstrumanek Gihanekek		Nam. İsm		Paşgîrek	
	Nexweş-ineke meji Sewalek		Medeniye-teke Ariyan Gida, bijûn		
Zîrek Ciya		Dê Dirb, ra	6		
	Sembola İridyûmê Rojek		Bi rûsî erê Cînavkeke îşarkî		
Daçekek Pêsir	3	Danek ji rojê			
	4	Xerabeyek li Qersê	5		



PEYVA VEŞARÎ →



■ Bi xêra birayên  
Söylemezan, tekiliya  
mafayê û leşkeran  
dîsa eşkere bû.



## Mamê Hûto!...

**E**z bi eslê xwe Licî me. Anika li cihêkî din mihendiziyê dikim. Ez dixwazim bi bîranîneke xwe dest bi nivîsa xwe bikim.

Ez xelet nebim 1961'ê de wê demê di lîseyê de min dixwend, bêhnvedanên somest- ra xwe min li Licê derbas dikirin. Xalê Fehmî (Fehmi Bilal), şexsiyetê dîrokî û nemir, koçberiya malbata wan jî qediyabû, hatibûn welêt. Gel tev diçûn ba wî. Ez û çend heval jî çûn seredaniya wî. Pir tişt jê dipirsîn, wî jî bo şoreşa 1925'an agahî didan mêwanan, fetilî ser me û wiha got:

"Gelî xortan! Cihê we ne rûniştin e, cihê we çiyayên Kurdistanê ye, herin bigerin hûnê her tiştî bibînin, (tiştên kevnare) Kurdistanê nas bikin. Ez êdî pîr bûme, ezê bimirim, Kurdistan li hêviya we ye." Her wiha ev peyv divê ji me re bibe hempa û di riya van şêran de em bimeşin.

Em çawa çûne dibistana tirkan, me çawa

kuta kiriye û em anika çî ne, her tiştê me bi tesadûfî bûye, her kurd vê baş zanibe ku me çî zehmetî kişandiye. Mamosteyan ders didan, me tiştêk jê fem nedikir, nîvro ku em diçûn mal, dayikên me xwarin didan ber me, dilê me nediçû pê û serê me diêşî. Serokê artêşa tirkan dibêje: "Di navbera me û kurdan de qet tiştêk tune, li ber qanûnê em wekhev in, kurd jî fena me dibin mihendîs, doktor, mamoste û hwd. Ola me jî yek e."

Kesê ku bibêje ez mirov im, gerek e rast bipeyive, welatparêziyê her kes nikarê bi cih bîne, welatparêziya wan ji bona tirkan e, ne ji bona kurdan e. Navê wê, welatparêzî nîn e, nîjadperestî ye. Her ferdê kurd wekî wan naponîjin û kurdîtiyê jî nakin. Ew tiştê em ji wan daxwaz dikin ne kurdîti ye, em dixwazin em û ew wekhev bin, ew dibêjin aliyê mêzîna me bila giran be!

Ew dibêjin kurd qey kurdên 1920'an in ku alîkariya hatina wan kirine, dema ew cih

bûne li Anadolê, dibêjin hişê kurdan naşixule, emê wan bikin çov û çek û bêzerengiya xwe, em dê wan pişavî bikin û zimanê kurdî ji wan bidin jibîrkirin.

Belê; mixabin wan ji bona zimanê me gavên mezin avêtine, lê ew nikarin mêjiyê me û fikrên me bidin jibîrkirin. Tirkêş dibêje: "Kurd û tirk wek goşt û neynok in. Divê ji hev neyên qetandin". Rast e! Neynok ji wan re xeml e, hinekî dirêj dibe jê dikin, diavêjin ser sergoyê. Goşt dîsa li cihê xwe dimîne.

Encam: Me heya niha û ji vir pê ve jî me cudaxwazî nekiriye û em nakin, em dibêjin kurd û tirk bila goşt û hestî bin, ev jî li xweşiya wan naçe. Nemirê me yek bi yek di riya azadiyê de serê xwe gorî welat kirin. Em jî gere di riya wan de bimeşin, di nava me de vejîneke neteweyî çêbûye û şûra neteweyî hişyar e..

ŞENGO DIJWAR

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayınclık  
San. Tic. Ltd. Şti. adına  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN YÖYLER

Gerinendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê  
(Yayın Kurulu)  
AYNUR BOZKURT  
SAMİ TAN  
RAHMİ BATUR

Berpîrsê Karên  
Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

NAVNİŞAN  
Ayhan Işık Sok. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX  
(0 212) 293 53 19,  
251 90 13  
ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

BELAVKIRIN  
Birleşik Basın Dağıtım  
(BBD)

NÛNERÎTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimîndeyê Giştî

yê Ewrûpayê:

Mazhar Günbat

Suriye: Jan Dost

Berlin:

Silêman Sido

49-30-69002695

Hannover:

Selîm Biçûk

49-5721-81360

Munchen:

Mahmut Gergerli

49-871-670884

Bruksel:

Medenî Ferho

32-02-466037

Stockholm:

Robîn Rewşen

46-8-7510564

Bonn:

Ahmet Baraçkılıç

49 228 66 62 49

Hollanda:

Remzi İlhan

312 06 32 31 28

Celle:

Wezir Saçık

49 50 52 87 36

## YA TELEVÎZYONÊ...BERNAMEYA HEFTEYÎ YA TELEVÎZYONÊ.... BER

YEKŞEM: (23.06.1996)	18.35 – 19.00
17.50 – 18.35	Arkeolojî
Nûbihar	19.00 – 19.20
18.35 – 19.00	Nûçe
Çend dîmen ji	19.20 - 20.15
Kurdistanê	Venguvaz
19.00 – 19.20	20.15 – 20.35
Nûçe	Nûçeyên tirkî
19.20 – 20.15	20.35 – 21.30
Serçavan	Belgesel
20.15 – 20.35	(Selahattin Çelik)
Nûçeyên tirkî	21.30 , 21.40
20.35 – 21.30	Nûçeyên soranî
Belgesel	21.40 – 22.20
21.30 – 21.40	Hevpeyvîn
Nûçeyên soranî	22.20 – 22.50
21.40 – 22.10	Kenêreş
Kuştineke	22.50 – 23.05
bêdarizandin	Bûyerên navnetewî
22.10 – 23.30	23.05 – 23.45
Asurî-Panel	Jiyana gel
23.20 – 23.50	23.45 , 00.15
Dayik di rojiya	Muzîk
birçîbûnê de	00.15 – 00.30
00.15 – 00.30	Nûçe
Nûçe	Nûçe
DUŞEM: (24.06.1996)	ŞÊŞEM: (25.06.1996)
17.50 – 18.35	17.50 – 18.35
Nûbihar	Nûbihar
18.35 – 19.00	18.35 – 19.00

<b>MED TV</b>	
Mavi Vazo	19.00 – 19.20
19.00 – 19.20	Nûçe
Nûçe	19.20 – 20.15
19.20 – 20.15	Gelawêj
Jin û jiyana	20.15 – 20.35
20.15 – 20.35	Nûçeyên tirkî
Nûçeyên tirkî	20.35 – 21.30
20.35 – 21.05	Hevî û daxwaziyên gel
Rêze film: Anna	21.30 – 21.40
Frank	Nûçeyên soranî
21.30 – 21.40	21.40 – 22.20
Nûçeyên soranî	Hevî û daxwaziyên gel (dûmahîk)
21.40 – 22.20	22.20 – 23.20
Rewşa cihanê	Konser
22.20 – 23.40	23.20 – 00.15
Zimanê huner	Zanîngeha Med
23.40 – 00.15	00.15 – 00.30
Muzîk	Nûçe
00.15 – 00.30	Nûçe
Nûçe	PÛNCŞEM: (27.06.1996)
ÇARŞEM: (26.06.1996)	17.50 – 18.35
17.50 – 18.35	Nûbihar
Nûbihar	18.35 – 19.00
18.35 – 19.00	Mirov û xweza
Mirov û xweza	18.35 – 18.45

Muzîk	18.45 – 19.00
18.45 – 19.00	Çapemeniya Cihanê
19.00 – 19.20	Nûçe
19.00 – 19.20	Nûçe
19.20 – 20.15	Hevpeyvîn
19.20 – 20.15	20.15 – 20.35
20.15 – 20.35	Nûçeyên tirkî
20.35 – 21.00	Rojêke xweş
20.35 – 21.00	21.00 – 21.40
Muzîk	21.00 – 21.40
21.30 – 21.40	Nûçeyên soranî
21.30 – 21.40	21.40 – 22.30
Nûçeyên soranî	Hawarî Roşinbîrî
21.40 – 22.30	22.30 – 23.20
21.40 – 22.30	Warê Jêlê
22.30 – 23.20	23.20 – 00.15
Warê Jêlê	Kurdên Kazakîstanê
23.20 – 00.15	00.15 – 00.30
Kurdên Kazakîstanê	Nûçe
00.15 – 00.30	ÎN: (28.06.1996)
Nûçe	17.50 – 18.35
ÎN: (28.06.1996)	Nûbihar
17.50 – 18.35	18.35 – 18.40
Nûbihar	Xutba olî
18.35 – 18.40	18.40 , 19.00
Xutba olî	
18.40 , 19.00	

Klîp	19.00 – 19.20
19.00 – 19.20	Nûçe
19.20 – 20.15	Med dokument:
19.20 – 20.15	Kurdîstana Rojhilat
20.15 – 20.35	20.15 – 20.35
20.15 – 20.35	Nûçeyên tirkî
20.35 – 21.30	Gotûbêj
20.35 – 21.30	21.30 – 21.40
Gotûbêj	Nûçeyên soranî
21.30 – 21.40	21.40 – 00.15
Nûçeyên soranî	Gotûbêj (dûmahîk)
21.40 – 00.15	00.15 – 00.30
21.40 – 00.15	Nûçe
00.15 – 00.30	ŞEMÎ: (29.06.1996)
00.15 – 00.30	17.50 – 19.00
17.50 – 19.00	Nûbihar
19.00 – 19.20	19.00 – 19.20
19.00 – 19.20	Nûçe
19.20 – 20.15	19.20 – 20.15
19.20 – 20.15	Welatê rojê
20.15 – 20.35	20.15 – 20.35
20.15 – 20.35	Nûçeyên tirkî
20.35 – 00.15	20.35 – 00.15
20.35 – 00.15	Şox û Şeng
00.15 – 00.30	00.15 – 00.30
00.15 – 00.30	Nûçe

# Ev jî çîroka Hüseeyin e

Piştî kuştina beqî, 1535 kes xistin binçav. Wê rojê hatin mala me jî, polîsekî sivil bala xwe dayê ku wêneyê Mehmet Sincar bi dîwar ve daleqandî ye, hêrs bû, rahiştê li erdê da û wiha got:

'Me qenc kir ew kuçik kuşt.' Wê çaxê min xwe ranegirt û wiha got: Gelo di meclîsa we de kesekî wekî wî binamûs, bişeref û paqij hebû?..

**H**üseeyin Sincar, ji gundê Çalêya Mehsertêya Mêrdînê ye. Ew biraziyê Mehmet Sincar e. Li gorî jidayikbûnê û nasnameyê 21 salî ye, lê belê ew diyar dîke ku ew 12 salî ye, sedema vê yekê jî wiha tîne ziman: "Gava li Kurdistanê li Eruh û Şemdinliyê çek teqiyay wê gavê tarîfî qelişî û ronahî ji dayik bû. Ji ber vê yekê jî ez xwe 12 salî dibînim."

Ew bûye mîna masqotê greva birçibûnê; hema hema bibêjin ew 32 roj e ku bi stranên, gilî û gazincên xwe, kêfxweşî û nexweşiyên xwe pêşkêşî kesên ku beşdarî grevê bûne dîke. Carina hûn dibînin ku Husayîn ketiye nav sohbet û mijûlahiyên siyasî ku wê demê dengên kermêşan jî nayê bihîstin û carinan jî tê dîtî ku, ew ketiye navê û ji henekên wî, dayikên girtiyan û mêvan, ji kenan zikopiştî dîkevin

## Nezanî, bû sebebê seqetiyê

Hüseeyin Sincar ji her du lingên xwe û ji destekî xwe seqet e. Behsa seqetiya xwe dîke û wiha dibêje: "Gava ez 7 mehî bûm, li taxa me Dağlıoğlu muxtarê taxê, hin derzî li min xistin. Piştî çend rojan lingekî min felç bû, pişt re lingên min ê din û destekî min jî felç bûn. Pişt re em li nexweşxaneyên Ruha, Enqere, Mersîn û Edeneyê geriyan, lê me tu çare jê re nedît."


Wan salan apê min Fethî, ketibû nav têkoşîna Rizgariya Kurdistanê; li gorî bavê min ji ber vê yekê dewlet bi vê nexweşiya me re eleqedar nebû.

Ji ber ku rewşa malbata me ji aliyê aboriyê ve ne baş bû, heta sala 1995'an ez bi çapûlkan, li ser destan meşiyam. Piştî wê salê, me serî li dewletê da ji bo ku bîsikletekê bidin min. Lê belê nedane min. Bavê min wê çaxê li Edirneyê dişixilî û li wê derê ji min re bîsikleteke 3 tekel stand.

Beriya ku apê min Mehmet Sincar şehîd bikeve bi 2 mehan, min jê bîsikleteke baş xwest, ji bo ku biçim Newroz mewrozan û meşan. Wî jî, ji bo bîsikletê hinek ewraq-mewraq amade kirin. Piştî ku şehîd ket bîsikleta min hat. Lê belê wijdana min tehemûl nekir, çavên min bar nebûn ku ez li wê bîsikletê mêze bikim, lê siwar bibim. Ji ber vê yekê jî, min ew da hevalekî xwe. Ev salek e ku kalîkê min Tewfîk, ji min re motoreke 3 tekel şandiye."

Hüseeyin di salên 1990-1992'yan de li ber mix-azeya Çetinkayaya Edeneyê simit û çorek difirotin; ji bo ku alîkariya malbata xwe bike. Ew 8 bira û keçîkek in. Ew yê herî mezin ê malbatê ye û tenê bavê wî di firinekê de bi yewmiya 350.000 dişixule.

Ew êdî ve gavê bixwaze jî, nikare simitan



bifiroşe. Sedema vê yekê jî wiha tîne ziman: "Di wan salan de li Edeneyê gelek serhildan û meş çêdibûn. Di Newrozeke wiha de ez neçûbûm kar û ez li mehelê çûbûm meşa Newrozê. Polîsekî sivil yê sûkê, li wê derê ez dîtîm û dotira rojê hatin gotin 'tu PKK'yî yî' û demançe xistin serê min, gotin 'Emê te bikujin'. Çorek morekên min tev rijandin. Wan, ew kesên ku ez bi bîsikletê diajotim jî, tehdît dikirin û digotin: 'Bi vî ermenî re negerin, ewê we bişîne serê çiya.' Ji ber vê yekê min dev ji firotina karê simitan berda."

## Eger tu ne seqet bûya?!

Hüseeyin ji me re behsa bûyereke din dîke. Em ji devê wî wê veguhêzin: "Piştî ku apê min Mehmet Sincar li Batmanê şehîd kirin bi 2-3 mehan, li Taxa Dağlıoğlu bekçiyek ji hêla gerilayên ARGK'ê ve hate kuştin."

Wê çaxê polisên Edeneyê avêtin ser wê taxê û 1535 kes xistin binçav. Wê rojê hatin mala me jî, polîsekî sivil bala xwe dayê ku wêneyê (sûretê)

Mehmet Sincar bi dîwar ve daleqandî ye, hêrs bû, rahiştê li erdê da û wiha got: 'Me qenc kir kuçik kuşt.' Wê çaxê min xwe ranegirt û wiha got: Gelo di meclîsa we de kesekî wekî wî binamûs, bişeref û paqij hebû?..

Ew jî hêrs bû û gote min: 'Eger tu ne seqet bûya, minê di serê te de 3 qul vekirina' û rabûn çûn..."

Dema ew peyvên xwe diqedîne, Xaleta Helîme ya ku di greva birçibûnê de ye wiha dibêje: "Lawo xweziya her du lingên te jî hebûna.."

Li hemberî vê peyvîna Hüseeyin wiha dibêje: "Baş e ku tune ye. Ku hebûya, belkî îro ez li vê derê ne di nav we de bûm. Belkî ez yekî berdûş û serxweş bûma."

Hüseeyin diyar dîke ku ew 10 salên din jî mijûl bibe, peyvên wî xelas nabin. Ji ber ku wî gelek zilm û zordarî dîtîye. Di gotinên xwe yê dawî de jî wê dibêje: "Ez, ji gelê me hêvî dikim ku ew bi yek bin. Ji hev aciz nebin, li şehîdên xwe, li girtiyan xwe xwedî derkevin. Xebata ku ew di nav 4 dîwaran de dikin, em li vê derê nakin."